

# Tekane rê vegera li diyalogê ye

**Berdevkê HDP'ê Bîlgen got ku ji bilî pêşniyarên Ocalan tu rêyeke din a ku Tirkiyeyê ji vê rewşa kaotîk rizgar bike tune ye**

- Berdevkê HDP'ê Ayhan Bîlgen destnîşan kir ku dawiya dawîn dê bên ser rêya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan a ku der barê qanûna bingehîn de û wiha got: "Rêya herî rast xwe gihandina bingeha diyalogê ye."
- Bîlgen got ku heke paketa AKP'ê ji meclisê derbas bibe dê vîna gel bikeve dewrê û wiha axivî: "Gel di vê mijarê de çi qas hestiyar be dê Erdogan û alîgirên wî ji fêm bikin ku çareserî di makeqanûna demokratîk re derbas dibe."... R-6



## Bila walî ji dewrê derkevin

Hevserokê DBP'ê Kamuran Yuksek paketa AKP'ê nirxand û bi bîr xist ku AKP'î dibêjin "Di rêveberiyê de em dawî li reveberiya duserî tînin" û wiha got: "Wê demê bila di rêvebirina herêmî de jî dawiyê li pergala rêveberiya duserî bînin, bila walî ji dewrê derkevin û bila kesên hilbijartî bi rê ve bibin." ... R- 6


ROJEVA **Medya**

20 Çile În 2017 / e-mail: rojevamedya@hotmail.com / Buha: 1 TL Hejmar: 71


## Ji wekîlan re kartên 'NA'yê

Hêza Demokrasiyê û Kedê ya Îzmîrê di pêvajoya ku tûra duyemîn a guhertina paketa AKP'ê tê nîqaşkirin de, ji wekîlên HDP'ê yên girtî re kartên ku "na" li ser hatiye nivîsandin şandin... R.6



## Li zindanan îşkence heye

Îşkenceya li girtîgehan êdî hatiye wê astê ku girtî ji bo bala raya giştî bikêşin ser vê rewşê çalakiyên cuda li dar bixin. Li Girtîgeha Tîpa E ya Edeneyê zarokan koguş dan ber agir, 6 girtî û 5 gardiyan birîndar bûn. Li gorî agahiyên hatin bidestxistin ji 6 zarokên ev çalakî pêk aniye, rewşa 3'yan giran e...

Medya Rûpel - 2



## Li Astanayê vîna gelan tune ye

23'yê mehê li Astanayê bi serpereştiya Rûsyayê ji bo çarenûsa Sûriyeyê civîn dê were lidarxistin. Heta niha hêzên demokratîk nehatine vexwendin. Li ser vê dubendiyê Meclisa TEV-DEM`ê ya Kantona Cizîrê diyar kir ku civînên ku îradeya gelên Sûriyeyê tê de tune bin, ew red dikin....

Medya Rûpel - 5



## 'Peyakî bênav û nîşan' Reşîdê Kurd

49 sal di ser wefata helbestvanê kurd Reşîdê Kurd re derbas bûn lê îro jî bi karên xwe yên di warê wêje û rêzimana kurdî de deriyên nû li ber kurdîhezan vedike. Reşîdê Kurd helbestvan e û bi qasî helbestvan, zimanzan e jî. Hem di warê helbestê de hem jî di warê rêzimanê de xwedî berhem e ...

Medya Rûpel - 9

# SERKEFTIN TEQEZ E

Endamên Komîteya Rêveber ên PKK'ê Duran Kalkan û Murat Karayilan diyar kir ku ciwanên kurd bi berxwedana YPS'ê mohra xwe li dîrokê daye û dê ev berxwedan teqez bi ser keve. Şervanên YPS'ê jî da zanîn ku heta azadiyê dê têkoşîn bidome



### BERXWEDAN BI SER KET

Endamê Komîteya Rêveber a PKK'ê Duran Kalkan têkildarî berxwedanên xwerêveberiyê û tecrubeya YPS'ê nirxandinên girîng kirin û diyar kir ku ciwanên kurd bi berxwedana xwe serkeftina têkoşîna azadiyê mîsoger kiriye. Kalkan da zanîn ku dê êrîşkar teqez têk biçin.

### HETA AZADIYÊ TÊKOŞÎN

Endamê Komîteya Rêveber a PKK'ê Murat Karayilan got ku YPS'ê berxwedaneke ku mohra xwe li dîrokê bixe derxist holê û sala duyemîn a têkoşînê li hemû YPS'iyan pîroz kir. Şervanên YPS'ê jî bi boneya salvegerê ev peyam da: "Têkoşîna me heta Rêberê me û gelê me azad bibe dê bidome."... RÛPEL 7/8

### Ji Ocalan re azadî ji Kurdistanê re statu

NAV-DEM'ê li dijî faşîzma AKP'ê, bi şiyara "Ji Ocalan re azadî" banga mezinkirina berxwedanê kir. Li Efrîn, Kobanê û Mannheimê jî ji bo azadiya Ocalan çalakî hebûn... RÛPEL 7

## Ditirsin!.. Cumaalî Dogan

R8




## Em bi girtinan naqedin

**Rojnameger Mehmet Alî Ertaş diyar kir ku xebatkarên çapemeniya azad dê serî netewînin**

Bi girtina Midûrê Nûçeyan ê DÎHA'ya bi KHK'ê hat girtin Omer Çelîk, hejmara xebatkarên girtî yên ajansê gihaşt 11'an. Edîtorê DÎHA'yê Mehmet Alî Ertaş got ku ev zext û pêkutî dê tu carî meşa çapemeniya azad nekarin asteng bikin... RÛPEL - 6

## Pîr Alî Haydar Cîlasun wefat kerd

Serekê Rûmetî yê Tevgerê Elewîyê Demokratîke ra Alî Haydar Cîlasun 27ê kanûna 2016 de wefat kerdo. Goreyê izeheto nuşteki, Cîlasun 27ê kanûna 2016 de saet 08.10 de bi merasîmêk ameyo definkediş... RÛPEL - 11



## FED'ê dolar buhatir kir

Siyaseta hikumeta tirk kir ku aboriya Tirkiyeyê têk biçe û bi daxuyaniyên bankayên navneteweyî û siyasetmedaran yekcar xerabtir bibe. Daxuyaniya FED'ê buhayê dolar zêdetir kir... RÛPEL - 6

www.arsivakurdi.org

# Jin bi perwerdeyê dibin xwedî îrade



**KONGREYA STAR** xebatên xwe yên perwerdekirina jinan bi rêya akademî û vekirina dewreyan berdewam dike. Endamên Saziyên Civaka Sivîl, komîn û meclisên kantona Kobanê û bajarê Girê Spî beşdarî van dewreyan dibin. Jinên ku tev li perwerdeyê bûn axivîn. Endama Meclisa Zagonsaz Izdîhar Ehmed got ku armanca wan ji perwerdeyê bipêşxistina fikr, naskirina rastiyê û rêya ber bi azadiyê ve ye. Fatma Ismaîl a ku çavên wê nabînin da zanîn ku ji bo ku ez xwe bi rêxistin bikim, dîroka jinan û rastiya Rêber Abdullah Ocalan nas bike tev li perwerdeyê bûye. Fatma Îsmaîl bang li hemû jinên Kobanê kir ku tev li perwerdeyê bibin û xwe bi pêş bixin. Her wiha dewreya Şehîd Medya Ararat a Akademiya Kongreya Star ku 19 jinên ji Kobanê û Girê Spî tev lê bûbûn bi dawî bû. Di perwerdeya ku 15 rojan dom kir de gelek ders hatin dayîn. KOBANÊ – ANHA



# Serpêhatiya mirin û koçberiyê

**Çeteyên DAIŞ'ê li Rojava û Sûriyeyê dixwazin bi taybetî jiyanê li jinan bikin jehr. Her jina ku tê azadkirin xwedî çîrokekê ye. Rexmî hemû êş û azaran jî YPJ/YPG û HSD bûne çavkaniya rizgariya welat**



NÛRŞAN IBRAHÎM / KOBANÊ - ANHA

Emel El-Adil a 37 salî, ji niştecihên bajarê Reqqayê ye. Emel dayika 3 zarokan e, çeteyên DAIŞ'ê di 11'ê îlona 2015'an de hevjînê wê Ewad El-Nezal (38) girt, 45 rojan ew di girtîgehên xwe de hiştin û îşkence lê kirin, paşê jî li qadekê li pêşberî her kesî serê wî jê kir.

Emel bi dilekî biaxîn û çavekî bihêsr behsa serpêhatiya xwe ya tijî êş dike. Emel diyar kir ku ew ji ber zilma çeteyan ditirsiya û wiha got: "Zarokên min dibêjin ka bavê min, çima bavê me kuştin. Ma gunehê me çi ye, çima em hatin koçberkirin û em ji malên xwe hatin derxistin." Emel dibêje ku çeteyên DAIŞ'ê bê sûc û sebeb di avêt ser malên wan û wiha axivî: "Çeteyên DAIŞ'ê bi hinceta ku têkiliyên hevjînê min û birayê xwe re heye, ew girtin. Em ji ber kiryarên çeteyan ne di tu halî de bûn, ji me re digotin 'hûn kafir in divê hûn bên qetilkirin', êrîşî malên me dikirin da ku em koçber bibin."

Emel da zanîn jinan ji ber hovîtiya çeteyan êş dikişandin, mafên wan binpê dikirin û ew îşkence dikirin. Emel anî ziman ku yek ji wan jî ez bûm, dema bihîstin ku di mala min de cigare hene, ew ceza kir. Emel got ku wan êdî nema dikarî hovîtiya DAIŞ'ê tehemul bikin û neçar man û birevin û ev tişt anî ziman: "Ez û zarokên xwe û malbata hevjînê min, şevekê bi dizî ji bajêr derketin û di nava du rojan de me xwe gihand gundên ku HSD'ê rizgar kirine. Paşê şervanên HSD'ê em gihandin kampa Eyn Îsa ya koçberên Reqqayê." Emel diyar kir ku ew niha di bin parastina HSD'ê de bi aram dijîn û herî dawî bang li HSD'ê kir ku Reqqayê ji çeteyên hov rizgar bikin.

# Gel dê kolanan terk neke








Li bajarê Frankfurt û Dusseldorf ên Almanyayê û li bajarê Marsilya, Strasbourg û payxeta Fransa Parîsê çalakiya edaletê ya ji bo yek ji damezirînera PKK'ê Sakîne Cansiz, endama KNK'ê ya Parîsê Fîdan Dogan û endama Tevgera Ciwanan Leyla Şaylemez ên ku di 9'ê Çileya 2013'an de hatibûn qetilkirin, berdewam dikin.

Di çalakiyan de dirûşmên "Kujer Erdogan", "Kujerê zarokan Erdogan", "Şefê DAIŞ'ê Erdogan", "Merkel fînanse dike, Erdogan bombeyan dibarîne", "Jin jiyan azadî-Sara, Rojbîn, Ronahî" hatin qîrîn. Di çalakiyan de hat destnîşan kirin ku dê gelê kurd heta edaletê nebîne kolanan terk nake û bang li hikumeta Fransayê hat kirin ku di demeke kin de komkujiyê ronî bike, ku neke dê gelê kurd destê xwe ji stûyê Fransayê bernede û banga beşdarbûna çalakiyan li gel hat kirin. *ANF*

# 'Bi tirsê nikarin me biçewisînin'

Ji aliyê walîtiya Amedê ve 11 şaredariyên DBP'ê ji destê rayedarên wê hatin girtin û yek ji van jî şaredariya Çinarê bû. Ji aliyê qeymeqamê navçeyê ve 37 kes ji kar hatin avêtin. 5 xebatkarên jin ên Navenda Jinan Jinwar jî kar hatin avêtin. Midûra Polîtîkaya Jinan Halîde Turkoglu jî di 22'yê mijdarê de bi KHK hat îxrackirin. Civaknasa Navenda Jinan a Jinwar Umran Nar, alîkara Zîrek, Remziye Duran, Seval Akta û Meşîde Boylu ji aliyê qeymeqam ve bi hinceta 'di 2017'an de personelên vîzeya wan ne di cih de ye' ji kar hatin avêtin. Li navendê bi van derxistinan xebatkar neman.

Hevşaredara Çinarê Rukiye Eryilmaz diyar kir ku şaredariya Çinarê berê di destê AKP'ê de bûye û wiha got: "Wê demê qet xebatkarên jin tune bûn. Piştî şaredarî ket destê DBP'ê her tişt guherî. Divê Çinar bê vegotin. Çinar li gorî navçeyên din hesas e. Me ji bo jinan Navenda Jinan a Jinwar ava kir. Me pergala hevserokatiyê pêk anî û gelek xebat kolektîf dan meşandin." Eryilmaz destnîşan kir ku armanca wan ew bû ku pêşî li zewaca zarokan bigirin û wiha axivî: "Li gel vê me li dijî şîdeta li ser jinan têkoşîn da. Beriya qeyûm bê ji bo xebatkarên me pêşniyara sîxurtiyê hat kirin. Bi dehan carî hatin binçavkirin. Jinên şaredariyê û saziyê di bin tacîza polîsan de xebat meşandin. Jinan bi rastî di vê pêvajoyê de xebatên baş dan meşandin. Ji ber vê yekê jin hatin girtin û rastî şîdetê hatin. Ji ber ku ji van jinan ditirsin. Piştî qeyûm hat 37 kes ji kar hatin avêtin. Niha li şaredariyê qeyûmê fermî tune ye, yê fîilî heye. Niha qeymeqam hat tayînkirin. Ew bi me nikarin." *AMED - ŞÛJIN*





# Zehmetiya avê dikêşin

Li mezraya Geduk a taxa Kurubaş a Artemêta Wanê ku ji 20 malan pêk tê, bi salan e av nayê dayîn. Jinên mezrayê da zanîn ku zivistan ji bo wan pir zehmet e û got ku bi barîna berfê re her der dibe cemed û ew jî ji boriyeke biçûk a li nava mezrayê avê dibin malên xwe.

Gurbet Ersoy (34) a ji Elbakê çûye Gedukê diyar kir ku ji roja hatine pirsgirêka avê dijîn û wiha got: "Em hemû ava xwe bi bîdonan li ser milê xwe tînin. Berê em li gundê girêdayî navçeyê diman. Li wir pirsgirêka avê ev qas tune bû. Min got belkî ez biçim mezraya girêdayî Wanê û rehet bibim. Lê mixabin em li dijî avê tê dikoşin. Me serî li şaredarî û walitiyê da jî lê belê tu encam negirt."

Gulîzar Kaya (46) di erdhêja Wanê de koç kiriye û li mezrayê di maleke kirêkirî de dimîne û wiha axivî: "Rê dişemitin. Kesek ku avê bîne malê tune ye. Ez bê mecal im. Divê demildest pirsgirêka me ya avê bê çareserkirin." Zerîf Delî ya 20 salî jî got ku berê mezra qelebalix bû, ji ber avê kes venagere gund û bang li rayedaran kir ku demildest pirsgirêka wan çareser bikin. WAN – ŞÛJIN

## Gotinên Dayika Eyşê

Destar

**Sarya Denîz**

Em li odeyeke nexweşxaneyê ya grî, xembar û bêhnteng in. Dayikeke pîr û nexweş. Li dijî nexweşiyeke giran têkoşîna jiyanê dide. Di vê serdana me de rojeva êdî nabe nexweşî yan jî tedawiya dayikê. Ji berk u dayik bi xwe ne di rojeva xwe de ye. Xwe li ser nivînan dirêj kiriye û di televizyona li pêşberî xwe de serê her saetê li nûçeyan temaşe dike û ev yek ji bo wê girîngtir e. Qet ji nûçeyan namîne. Melûm e, rewşa medyayê ji baş dizane, lê belê bi hêza xwe ya şîrovekirinê dizane bê ka dê çi, çawa fêm bike. Ji bo wê ji nexweşiya wê girîngtir tişt hene.

Dibêje; "Ez hêvîdar im, ji ber ku min têkçûna Seddam jî dît. Hûn baş pê nizanin, ez ji we re bibêjim; desthilatiyek, dewletek berî ku têk biçe, pereyê wê bê qedr dibe. Têkçûn ji vir dest pê dike." Pê dizane ku xwedayê pergalê pere ye. Dibêje; "tişta ku niha li Tirkiyeyê pêk tê, eynî wekî rewşa Iraqê ya berê ye. Dawiya Erdogan nêzîk e, hûn ê bibînin; ew jî dê wekî Seddam be." Hevrûkirina Seddam û Erdogan li gorî tecrubeyên xwe dike. Gotin û şîroveyên dayika Eyşê ji yên gelek akademîsyen û pisporan gelekî xuttir û bi bandortir in.

Di van rojên dawîn de her kes qala dîktatoriyan dike ku derketina wan hema dişibe hev. Bêguman tiştên ku tên gotin û nivîsandin rast in. Her wiha têkçûna wan dîktatoriyan jî dişibe hev. Dayika Eyşê baş pê dizane ka dîktatoriya Seddam çawa Iraq ji cîhanê îzole kir û wisa kir ku her kes ambargoyeke mezin dayne ser. Her çend ji aliyê aborî, siyasî û civakî ve ferq û cudahiyên Tirkiye û Iraqê hebin jî, ji aliyê birêvebirinê de pir zêde dişibin hev. Tirkiye pir bê hêsanî dikare bibe wekî Iraqm lê bê. Lê ji bo pêşîlêgirtina vê pêdeçûnê rê û rêbaz hene. Bawerî û pêşbîniya her kesî heman e ku dê dîktatoriya Erdogan biçe, lê belê ji bo ku Tirkiye nebe Iraq gelek tişt dikarin bên kirin.

A herî girîng jî ew e ku; her çend tê xuyan ku civak ji vê yekê re bê deng dimîne jî, rojeva vê dayika di odeya nexweşxaneyê de vê tespîtê piştrast nake. Tê dîtin ku civak bertekên xwe li hev zêde dike. Li benda dema derkirina van bertekan e. AKP ji hêrsa civakê ditirse. Loma hemû dengan tepeser dike. Lê dîsa jî pê nikare. Haya wan jî jê heye ku civak dikare hemû planên wan têk bibe. Ji hemû derdorên civakê ditirsin.

Bîra civaka Tirkiyeyê zindî û xurt e. Ya ku nehêle Tirkiye bibe Iraq, berteka birêxistinkirî ya civakê ye. Loma pêvajoya referandûmê ku tê payîn di biharê pêk were, girîng e. Va ye ji ber vê yekê divê "na" baş were birêxistinkirin û birêvebirin.

Gazinca dayika Eyşê ji wê yekê ye ku rastî ji civakê re baş nayên gotin, dibêje; "Divê bi mînakên wiha ji gel re bê vegotin, di vê bertekên mirovan baş werin birêxistinkirin." Ev rexne ji hemû derdoran re ne ku ji civakê re pêşengiyê dikin. AKP çawa ku bi lez û bez tev digere, divê her wisa hemû berteka li dijî wê jî, bi lez û bez bê birêxistinkirin. Mafê tu kesî tune ye hinekî din li bendê bisekine.

www.sarayakurdi.org

## Pirtûk wek delîlê sûc hat hesibandin!

Gulcîhan Gultekîn a li Savurê bi ser mala wê de hat girtin û hat binçavkirin, hinceta girtina wê jî asta hiqûqa li Tirkiyeyê careke din nîşan da. Gultekîn bi hinceta pirtûka 'Dîwan' a Feqiyê Teyran ku bi talîmata Serokomar Erdogan ji aliyê Wezareta Çand û Turîzmê ve hatiye çapkirin li mala wê heye û her wiha tevî ku platîn di çîpa wê de bûye bi kurye-vaniyê hat sûcdarkirin. **MÊRDÎN**




## Ew jî parçe parçe bûn

Di komkujiya Pirsûsê de ji ber midûrê emniyetê Mehmet Yapaliel peywira xwe xerab bi kar anî 7 hezar û 500 TL cezayê pere bi teqsîdan lê hat birîn. Nûçegihana ETHA'yê Havva Cuştan ku wê demê endama SGDF'ê bû ceza nirxand. Cuştan bertek nîşanî ceza da û da zanîn ku bi vê biryarê re ew li 7 hezar û 500 parçeyî veqetandine. Coştan diyar kir ku heta ew nebêjin qediyaye, neqede. **STENBOL**




## Ji ber kirîna nan doz lê hat vekirin

Ji ber kirîna nan doz lê hat vekirin Welatiyê bi navê M.G. (61) ku li gundê Dereîçî yê navçeya Kercewsê ya Êlihê dijî, der barê wî de bi îdiaya "alîkarî daye rêxistinê" doz hate vekirin. Di encama guhdarkirina telefonan de ji ber ku M.G. çewalek ard, çewalek şekir, 2 kolî xurek, 12-15 pîde û hinek jî fêkî û sebze kirîne, ev yek wek hinceta "alîkariya rêxistinê" hat dîtin û doz lê hate vekirin. Di rûniştina 3'yemîn a dozê de der barê wî de ceza hat xwestin. Ji heyeta ku M.G. didarîzînîn 2 dadger ji ber ku endamên cemaeta Fetullah Gulen in hatin girtin. doz taloqî 18'ê adarê hat kirin. **ÊLIH**



## Karkeran dest bi çalakiyê kir

Li navçeya Şirwanê ya Sêrtê di 17'ê mijdarê de hezan pêk hatibû û di hezanê de 16 karkerên kanê di bin axê de mabûn û jiyana xwe ji dest dabû. Piştî bûyerê 4 firmayên taşeron ewil 200 karker û piştre jî hat diyarkirin ku 142 karkeran jî heta 31'ê çileyê ji kar dûr bixe. Li ser vê yekê karkerên kanê dev ji kar berda û dest bi çalakiya rûniştinê kir. Serokê Maden-Îşê Cevher Anik got ku heta karê wan paşve nedin wan dê çalakiya wan bidome. **SÊRT**



# Zarokan girtîgeh da ber agir

**Li Girtîgeha Zarokan a Edeneyê zarok li dijî pêkutiyên rêveberiya girtîgehê nivînên xwe dan ber agir. Di bûyera de tevî gardiyanan 11 kes birîndar bûn û rewşa 3 zarokan giran e**

Li Girtîgeha Tîpa E ya Edeneyê di şewata ku zarokan koguş dan ber agir de 6 jê girtî, 5 gardiyan bi temamî 11 kes birîndar bûn. Li gorî agahiyan 6 zarokên ku temenê wan di navbera 14-18 saliyê de li koguşê bi şev saet di 23.45'an de nivînên xwe dan ber agir. Şewat di demeke kin de belav bû û gardiyanan koguş vala kirin û mudaxaleyî şewatê kir. Îtfaiyeya ku piştre hate girtîgehê şewat vemirand.

6 zarok û 5 gardiyanên ku ji ber şewatê bi bandor bûn rakirin nexweşx-aneyan û hate hînbûn ku rewşa 3 zarokan giran e. Waliyê Edeneyê Mahmut Demîrtaş têkîldarî mijarê di daxuyaniya xwe de got ku di şewatê de 6 zarok û 5 gardiyan ji ber dû jehrî bûne, rewşa 3 zarokan giran e.

Koguşa Zarokan a Girtîgeha Tîpa E ya Kurkçulerê ya Edeneyê bi muameleya xirab hatibû rojevê. Lêpîrsina ku der barê 4 gardiyanan de ji ber ku di 5'ê çileyê de îşkence li 5 zarokên nû kirine, di doza hatibû vekirin de bi bêşapondinê encam bû. Dozgeriyê dîmenên kamerayê lêkolîn nekirin, li gel rapora Saziya Tiba Edlî ji bo lêpirsînê delîl nedît.
*EDENE - DÎHABER*





## Qeyûm her tiştî li Amedê qedexe dike

Li Amedê li ser talîmata qeyûman gelek tişt tên qedexekirin. Hat zanîn ku qeyûman talîmata gelek qedexeyan daye. Di çarvoçeya van qedexeyan de biryara ku otoparkên li şûna avahiyên hatine hilweşandin bên girtin û dezgehên li kolanan firoşkariyê dikin bên rakirin. Hat zanîn ku qeyûm gotiye bila erebokên destan jî ji nav bajêr bên komkirin.

Dê bi rakirina erebokên destan, tablayan û girtina otoparkan bi hezaran welatî ji karên xwe bibin û nekarin bixebitin. Karkerên li otoparkan dixebitin, tablavan û kesên erebokên destan bi kar tînin, li dijî vê biryarê bi bertek in. Yek ji van karkerên otoparkan ku ji ber ewlehiyê navê xwe neda, destnîşan kir ku ew debara malbata xwe bi karkeriya vê otoparkê dike û got ku dema ev otopark bê girtin ew nikare nan bibe nav zarokên xwe. Tablavanekî ku cigareyan difiroşe û nexwest navê xwe bide jî anî ziman ku nîvê muşteriyên wî polîs û leşker in û got ku ji ber buhabûna cigareyan kes nikare cigareyên Tekelê bifiroşe û her kes berê xwe dide ser dezgehên wan.

Hemalan jî got ku ew ê li gorî kêfa qeyûman tev negerin û got ku ew ê ji bo debara malbatên xwe karên xwe berdewam bikin. Karkeran da zanîn ku erebokên destan yek ji karekî herî qedîm ê li Amedê ye û got ku ji bilî vî karî tu karekî din tune ye.
*AMED - DÎHABER*

## Dê Însiyatîf bibe dengê girtiyan

Li Amedê, Însiyatîfa Piştevaniya bi Zindanan re ya bi mebesta piştevanî û alîkariya bi malbatên girtî û hikumxwaran hat avakirin, mebesta wê ew e ku li pirsgirêkên girtî, hikumxwar û malbatên wan çareser bike û binpêkirinên mafan ên pêk tên, ragihîne

Hevserokê TUAD'ê Arif Yilmaz der barê xebatên însiyatîfê de agahî dan. Yilmaz anî ziman ku wan yek bi yek xwe gihandiye malbatan û hewl didin pirsgirêkên wan çareser bikin.



Yilmaz ragihand ku ew berê rastî gelek serdagirtin, çewisandin û pêkutiyan hatine û niha gelek rêveber û hevserokên wan girtî ne û wiha got: "Piştî ku hemû komele û şaxên me hatin girtin, li nêzî 15 bajaran li ser esasekî dildariyî hevalên me tev geriyan û Însiyatîfa Piştevaniya bi Zindanan re hat avakirin. Her çi qas zehmetiyên wê hebin jî dê Însiyatîfa Piştevaniya bi Zindanan re ji bo çareserkirina pirgirêkên malbatên girtiyan tev bigere û bibe dengê girtiyên li zindanan."
*STENBOL – DÎHABER*

## 'Em bê alternatîf nîn in'

**PIŞTÎ KU LI** Tirkiyê OHAL hat îlankirin gelek saziyên kurdan bi qanûnên KHK'ê hatin girtin. Yek ji van saziyan MEYA-DER bû. Malbat û dayikan bertek nîşanî girtina MEYA-DER'ê da û diyar kir ku hikumet bi van pêkutiyan nikare nirxên dîrokî ji holê rake.

Dayika bi navê Kewê Işik anî ziman ku girtina MEYA-DER'ê napejirînin û wiha axivî: "Hikumetê bi girtina MEYA-DER'ê xwest derbeyekê li nirxên me bide. Me bi saya MEYA-DER'ê cenazeyên xwe bi hêsanî digirtin û bi girseyî defin dikirin lê niha hatiye girtin û dixwazin me malbatan bê çare bihêlin."

Dayika Leyla Duman jî bi lêv kir ku ew ê heya dawî li ber xwe bidin û da xuyakirin ku ew bê alternatîf nîn in. Her wiha dayika bi navê Besna jî diyar kir ku heya ew li ser rûyê cîhanê bin ew ê tu carî destûr nedin ku dewlet cenazeyên wan li goristanên bêkesan defin bike û wiha got: "Em biryara girtina MEYA-DER'ê jî qebûl nakin çi qas destê me bê em ê li nirxên xwe xwedî derkevin." **WAN - DÎHABER**







## Hê jî şopên xwînê lê hene

Li Artemêtana Wanê du jin di serdagirtina malekê de hatibûn qetilkirin. Xwediyê malê Ayşe Mamuk têkîldarî bûyerê axivî. Mamuk anî ziman ku ew di hundirê wesayîtê de sekinîbûn, lê hîna mala wan dihat gulebarankirin. Piştî dengê çekan sekinî ketin malê, piştre dîsa gule lê reşandin. Piştre du tûrên reş ji malê derxistin û xistin nava darbestê."

Şahîdên bûyerê da zanîn ku mal heya şefeqê hatiye gulebarankirin û piştî gulebaranê dengê çekan ji malê hatiye û piştre di odeya piştê yê malê de teqîn pêk hatiye. Şahîdên ku îdia kir ku jinek di malê de bombeya bi xwe ve teqandiye, jiyana xwe ji dest daye, destnîşan kir ku piştî tîmên taybet dikevin malê jineke din a birîndar jî înfaz kiriye. Di xaniyê ku heya şefeqê hatiye gulebarankirin de, şopên xwînê û guleyan hîna tên dîtin. **WAN - DÎHABER**

## Rojên xweş û geş li paş man

Ugur Kaymaz ê 12 salî, dema ji bo bavê xwe bi rê bike derket ber deriyê malê 13 gule li bedena wî ketibûn. Piştî bûyera di 21'ê mijdara 2004'an de pêk hat heta niha tu kenîn û bişirîn li rûyê malbatê peyda nebûye. Di doza der barê 4 polîsan de hat dayîn de, polîs rastî hikmê "di nav sînorê parastina rewa de tev geriyane" hatin. Makbule Kaymaz a tevî 3 zarokên xwe bi tenê ma, ji bo debara malbata xwe bike li şaredariyê dest bi kar kiribû, lê di 23'yê mijdara 2016'an de bi Biryarnameya di Hikmê Qanûnê de ji karê xwe bû.

Makbule Kaymaz li dijî îxrackirina xwe serî li rêyên hiqûqî da. Kaymaz got ku kesekî ku debara malbatê bike tune ye û li wêneyê malbatê yê berê dinihêre û wiha dibêje: "Ew rojên xweş û geş li paş man."
*MÊRDÎN - DÎHABER*



www.arsivakurdi.org

## Danûstandin 7’ê sibatê dest pê dikin

**JI ALIYÊ NÛNERÊ HIKUMETA** Ekvatorê Juan Meriguet ve hat ragihandin ku danûstandinên di navbera hikumeta Kolombiya û Artêşa Rizgariya Neteweyî (ELN) ku rêxistina herî mezin a duyemîn a gerîla ya li vî welatî ye, dê di 7’ê sibatê de bi rengekî fermî dest pê bikin.Meriguet daxuyaniya hevpar a ELN û hikumeta Kolombiyayê xwend û anî ziman ku parlamenterê berê Odin Sanchez Montes de Oca ku di destê ELN’ê de dîl e dê di vê çarçoveyê de roja 2’yê sibatê bê berdan. Li gorî lihevkirinê, dê heman rojê 2 endamên ELN’ê yên li girtîgehê bên efûkirin û werin berdan. Serokdewletê Kolombiyayê Juan Manuel Santos der barê danûstandinên aştiyê de du roj berê li Swîsreyê daxuyaniyek da û destnîşan kir ku armanca danûstendinên bi ELN’ê re aştiyeke giştî ye. QÎTO - ANF



# YE nijadperest û faşîstan fînanse dike

**Yekitiya Ewropayê (YE) di nav du salên dawîn de 2,3 milyon euro alîkarî daye komên faşîst û bi vî awayî ew fînanse kirine. Lê li gel biryara guhertina pîvanên alîkariyê jî YE alîkariya xwe didomîne**

MURAT KÛSEYRÎ / STOCKHOLM - ANF




Yekitiya Ewropayê (YE), di nav du salên dawîn de 2,3 milyon euro alîkarî da APF û AENM’ê ku kom û partiyên nîjadperest, nazî û faşîst di bin sîwana Yekitiya Ewropayê de ava kirine.

Ji ber nerazîbûnan, biryara lêpirsînê û sekinandina alîkariyê hat dayîn. Lê belê tevî vê yekê jî Parlamenta Ewropayê biryar da ku di sala 2017’an de alîkariya aborî li APF’ê bike.

Bi saya vê alîkariya Yekitiya Ewropayê, kom û partiyên nîjadperest û faşîst xwe hîn bêhtir bi rêxistin dikin, xebatên xwe yên dijminatiya li biyaniyan û îslamîfobîk zêde dikin.

Yekitiya Ewropayê di sala 2014’an de, ji bo pêşî li dayîna alîkariya aborî ji kom û partiyên dijberê demokrasiyê bigire, pîvanên alîkarîdayînê guherandin. Siyasetmedarên Yekitiya Ewropayê li dû hev daxuyanî dan û got ku nabe ji partiyên nedemokratîk re alîkarî bê dayîn. AENM’ê jî ev biryar şermezar kir.

**ALÎKARÎ DIDOME**

Kovara Expo ku xebatên komên nazî û dijminên biyaniyan, nîjadperestan ên li Swêd û gelemperiya Ewropayê dişopîne da xuyakirin ku Yekitiya Ewropayê li gorî vê biryarê tev nagere. Kovarê ragihand ku YE alîkariya APF û AENM’ê didomîne.

**BIRYARA SEKINANDINÊ**

Piştî ku biryara sekinandina alîkariya aborî ji bo partiyên nîjadperest û faşîst hat dayîn, di sala 2014’an de ji 10,1 milyon kron ji AENM, ji weqfa bi navê ‘Ewropa Nasname û Kevneşopî’ re 5,6 milyon kron alîkarî hat dayîn. Par ji APF’ê re 3,6 milyon, ji Ewropa Terra Nostra re jî 1,8 milyon kron hate veqetandin.

Tevî ku biryarên tundkirina pîvanên alîkariyê di sala 2014’an de hatin dayîn, ji ber ku Serokê Parlamenta Ewropayê Martin Schulz got wê biryar di çileya 2017’an de bikevin meriyetê jî, alîkariya aborî ya ji bo partiyên nîjadperest û faşîst berdewam kir.

## DYA bo Astanayê hat vexwendin

Wezîrê Karên Derve yê Rûsyayê Sergey Lavrov di civîna xwe ya çapemeniyê de ragihand ku wan DYA vexwendiye civînên çareseriya şerê Sûriyeyê yên ku li Astanayê bên lidarxistin û anî ziman ku ew hêvî dikin ku DYA vexwendinê biperjirîne û li her qada civînê di asta pispora de bê temsîlkirin.

Ji aliyê din ve Lavrov di daxuyaniya xwe ya çend roj berê de vexwendina DYA û



Yekitiya Ewropayê (YE) ji bo civîna Astanayê wekî gaveke baş be, nirxandibû.

Lavrov di daxuyaniya xwe de ragihand ku dibe ku serokê nû yê DYA’yê Donald Trump îro bi fermî dest bi peywira xwe bike û têkiliyên pêşî yên fermî li Astanayê bê danîn.

**ÎRAN NAXWAZE**

Rûsya li gel hemû bertekên Îranê, DYA vexwend civîna Astanayê. Wezîrê Karên Derve yê Îranê Muhammed Zarif Cewad di axaftina xwe ya ajansa Tasnimê de gotibû ku ew li dijî hebûna DYA’yê ne û ew naxwazin ku DYA beşdarî civînan bibe. *MOSKOV*

## Esad mijara Astanayê aşkera kir

**SEROKOMARÊ** Sûriyeyê Beşar Esad der barê civîna Astanayê de ku dê di 23’yê çileyê de pêk were, ji televîzyona japonî TBS’yê re axivî û wiha got: “Hêviya me ew e ku civînên Astanayê bibin platformek ji hemû sûriyeyiyan re da ku bikarin der barê her tiştî de biaxivin.”

Her wiha Esad teqez kir ku armanca sereke ya civînan, pêkanîna agirbestê ye ji bo ku sivîl bên parastin û alîkariyên mirovî bigihînin hemû deverên Sûriyeyê û wiha dewam kir: “Hîn ne diyar e bê diyalogeke siyasî di van civînan de pêk were yan na û hîn ne diyar e kî beşdar bibe.”

Ji aliyê din ve Esad li ser şêwaza civînên Astanayê jî axivî û wiha got: “Heta niha em wiha bawer dikin ku ev civîn dê gotûbêjeke di navbera hikumetê û komên çekdar de be, ji bo agirbest pêk were û rê li ber wan koman vebe da ku tev li lihevhatinê bibin. Ango dest ji çekên xwe berdin û efûya dewletê wergirin. Niha tenê ev tişt te payîn.” ŞAM



## Di êrîşê de herî kêm 60 kes mirin


Li Maliyê di encama êrîşa wesayîta bombebarkirî ya ku du roj berê li dijî kampa leşkerî de 60 kes hatin kuştin û 115 kes jî birîndar bûn. Serokdewletê Maliyê Îbrahîm Keita di daxuyaniya xwe de ragihand ku di encama êrîşê de 60 kesan jiyana xwe ji dest da û destnîşan kir ku ew ê dijminên xwe têk bibin.

Her wiha piştî êrîşê li seranserî welat 3 roj şîna neteweyî hat ragihandin. Ji aliyê din ve li gorî zanyariyên berdest êrîşa bombeyî baskê El Qaîde yê Mexrîb El-Murabîtîn girtiye ser xwe û êrîşê ji ber hevkariya Maliyê bi Fransayê re pêk anîne. BAMAKO



## Misrê hemû malbata Mursî xist ‘lîsteya terorîstan’

Hat ragihandin ku rêvebiriya Misrê hemû malbata Serokomarê Misrê yê berê Muhammed Mursî xistiye lîsteya terorîstan. Kure Muhammed Mursî Ahmed Mursî li ser hesabê xwe yê medyaya civakî ragihand ku Serokkomar Mursî, hevsera wî, zarokên wî Şeyma Usame, Omer, Abdullah û ew di nav lîsteya terorîstan de cih digirin. QAHÎRE



## Di qezayê de 24 zarokan jiyana xwe ji dest da

Li eyaleta Uttar Pradeş a bakurê Hindistanê wesayîta xwendevanan û kamyona xîz li hev qelibîn û di encama qezayê de 24 xwendevan zarok jiyana xwe ji dest da.

Berpirsê Midûriyeta Ewlehiyê ye eyaleta Uttar Pradeş a Hindistanê Javeed Ahmed di daxuyaniya xwe de ragihand ku kamyona ku gelekî lezgîn diçû ji paş ve li wesayîta xwendevanan ku emrê wan di navbera 4 û 12’an de bûye qelibiye û herî kêm 24 xwendekaran jiyana xwe ji dest daye. DELHÎYA NU

## DAIŞ her ku diçe biçûk dibe

Li gorî daneyên şîrketa analîzê ya IHS Markitê, çeteyên DAIŞ’ê 18 kîlometrekare axa di destê xwe de winda kiriye û tenê herêmeke 60 hezar kîlometrekare di destê wê de maye. Ev jî nîşan dide ku DAIŞ di sala 2016’an de bi awayekî lezgîn ber bi tunebûnê ve diçe.

Her wiha şîrketa IHS Markitê di analîza xwe de diyar kir ku di nav sedemên bidestxistina bajarê Reqqayê de zehmetiyên siyasî û leşkerî hene.

Lewma Reqqa wekî navendeke DAIŞ’ê tê zanîn û heta şerekî dijwar nekin dê dev ji bajêr bernedin. LONDON

## Hevdîtinên li ser Ûkraynayê dê ji nû ve dest pê bikin

Li Ûkraynayê ku ev 3 sal in çareseriyeke siyasî nehatiye peydakirin, hat ragihandin ku dê hevdîtinên navbera Rûsya, Almanya û Fransayê bidomin.

Li gorî daxuyaniya Qesra Kremlînê, Serokdewletê Rûsyayê Vladîmîr Pûtîn bi rêya telefonê bi lîderên Almanya û Fransayê re axivî ye.

Di daxuyaniyê de hat ragihandin ku di encama vê axaftinê de biryar hatiye dayîn ku hevdîtina navbera rayedarên Rûsya, Almanya, Fransa û Ûkranyayê ji nû ve werin destpêkirin. Di daxuyaniyê de hat gotin, ev hevdîtin wê di ‘astên cuda’ de bên meşandin. Lê nehat aşkerakirin ku dê hevdîtin di asta wezîran de yan jî di asta heyetên pispor de bidomin. *MOSKOV - ANF*



## Ji bo rizgarkirina Tilkefê operasyon hat destpêkirin



Artêşa Iraqê piştî ku aliyê rojhilat ê Mûsilê bi temamî kontrol kir, duh danê sibê berê xwe da bajarokê Tilkef ê li bakûrê rojavayê bajêr. Bajarokê Tilkef ku nêzî 2 mehan e ji aliyê hêzên artêşê ve hatiye dorpêçkirin.

Serokwezîrê Iraqê Haydar Ebadî daxuyaniyek da çapemeniyê û diyar kir ku tevî rojhilatê bajêr gelek navendên bajêr hatine rizgarkirin û wiha got: “Hêzên me ji bo rizgarkirina tevahiya Mûsilê bi pêş ve diçin. Rizgarkirina tevahiya Mûsilê û serkeftin, nêz e.” *MÛSIL - ANF*

www.arsivakurd.org

Rojeva Medya
20 Çile 2017 În

# Artêşa tirk li pey provakasyonê ye!



Provakasyonên hêzên artêşa tirk ên li dijî rojavayê Kurdistanê didomin. Li gorî agahiyan, balafirên şer û yên keşfê yên artêşa tirk li ser asîmanê Kantona Efrînê û herêma Şehbayê geriyan.

Li gorî agahiyên ji herêmê, balafirên şer û yên keşfê yên artêşa dewleta tirk a dagirker li ser navçeyên Cindirês, Şiye, Bilbil, Şera û Mabata yên Efrînê û gundên herêmên rizgarkirî yên herêma Şehbayê geriyan. Çavkaniyên ji herêmê da zanîn ku balafiran saet 10.00'an de ev provakasyon pêk aniye.

Hêjayî bibîrxistinê ye ku di 13'ê mijdara 2016'an de jî balafirên şer ên nehatin naskirin li dijî benda kontrolê ya gundê Xezawiyê yê Efrînê êriş pêk anîbû.

Di encama vê êrîşê de jî 9 sivîl hatibûn qetilkirin û 50 welatî jî hatibûn birîndarkirin. Fûzeya ku di êrîşa Xezawiyê de hatibû dîtin jî ji hêla Rûsyayê ve hatibû çêkirin.

**EFRÎN - ANHA**

## Ezmûnên xwendekaran bi dawî bûn

Ezmûnên serdema yekemîn ên 49 hezar û 159 xwendekarên dibistanên Kantona Efrînê û herêmên Şehbayê yên sala xwendinê ya 2016 - 2017'an bi dawî bûn. 49 hezar û 159 xwendekarên astên seretayî, navîn û lîseyê ezmûnên serdema yekemîn a sala nû ya xwendinê ku li gorî meteryalên ku ji aliyê Komîteya Perwerdeya Civaka Demokratîk (KPC – Demokratîk) ve hatine amadekirin bi dawî kirin. Xwendekar li 312 dibistanên Kantona Efrînê û herêma Şehbayê hatine belavkirin. **EFRÎN**



## TEV-DEM bi welatiyan re civiya

Komîteya Têkiliyên Dîplomasiyê ya TEV-DEM'ê bi armanca nirxandina rewşa dawîn a li herêmê û rewşa rêxistinî ya civakê bi welatiyên gundê Bacar ê Girkê Legê re civînek li dar xist. Di axaftinên civînê de rewşa siyasî ya Sûriyeyê û herêmê hat nirxandin û hat destnîşankirin ku di dema aloziyê de ya herî girîng yekitiya gelan e. Di civînê de rewşa xizmetguzarî ya gund jî hat nîqaşkirin û welatiyan pirsgirêkên xwe anîn ziman. **GIRKÊ LEGÊ**



## Bi gel re rêzecivînên danasînê li dar dixin

Desteya Rêveber a Federaliya Demokratîk a Bakurê Sûriyeyê bi armanca danasîna hevpemana civakî li Kantona Efrînê û herêmên Şahbayê dê di 26'ê çileyê de dest bi rêzecivînan bike. Der barê mijarê de endama Desteya Rêveber a Federaliya Demokratîk a Bakurê Sûriyeyê Rohilat Arif ev tişt anîn ziman: "Divê em xwe bi rêxistin bikin û plansaziya projeya xwe bidin xuyakirin. Ji bo avakirina Sûriyeyeke demokratîk ev pêngav, pêngaveke girîng e. Em bang li hemû şênî û saziyên herêmê dikin ku tev li civînên me bibin." **EFRÎN**



## YPG her ku diçe mezin dibe

Dewreya perwerdeyê ya Akademiya Perwerdeya Leşkerî ya Şehîd Xebat a li herêma Til Koçer ku 2 meh berê bi tevlîbûna 51 ciwanên ereb hatibû destpêkirin, bi dawî bû. Di merasîma dewreyê de fermandarê YPG'ê Mistefa Cizîrê dewre li şervanan pîroz kir û diyar kir ku ew di wê baweriyê de ne ku dê şervanên wan erka xwe ya parastinê pêk bînin. Herî dawî jî şervanan sonda leşkerî xwar û tev li refên YPG'ê bûn. **GIRKÊ LEGÊ**



# Dê biryarên li dijî vîna gel red bikin

TEV–DEM'ê bi daxuyaniyekê diyar kir ku ew biryarên ku ji civînên ku îradeya gelên Sûriyeyê bin dikin, nas nakin. TEV–DEM'ê da zanîn ku civîna Astanayê jî dê mîna yên din têk biçe



Meclisa TEV – DEM'ê ya Kantona Cizîrê bi daxuyaniyekê diyar kir civînên ku îradeya gelên Sûriyeyê temsîl nakin, dê ji hêla wan ve neyên qebûlkirin.

Di daxuyaniya Meclisa TEV-DEM'ê de hat destnîşankirin ku hêzên qaşo ji bo çareseriya aloziya Sûriyeyê civînan li dar dixin di çareseriyê de xwedî proje nîn in û ev tişt hatin ragihandin: "Ev hêz sûcdar in û sersebebên kûrbûna krîza Sûriyeyê ne. Beriya civîna Astanayê jî rêzecivînên Cenevreyê hatin lidarxistin lê bê encam man. Niha li Astanayê beyî nûnerên gel, dixwazin civînê li dar bixin."

**RÊYA ÇARESERIYÊ**

TEV-DEM'ê diyar kir ku di 6 salên aloziyê de di civînên ji bo çareseriyê pêk hatin de ji ber ku nûner û vîna gelên Sûriyeyê nehatin vexwendin û ev civîn têk çûne û wiha bi dawî kir: "Rêya çareseriyê ew e ku gel xwe bi xwe, xwe bi rê ve bibe. Ji bo vê yekê projeya herî guncaw federaliya demokratîk e. Lewma jî em dibêjin ku biryarên ku vîna gelên Sûriyeyê esas negirin, em red dikin û em ji aloziyên ji ber vê yekê jî berpirsyar nîn in. Em bang li hemû gelan dikin ku ji bo federaliya demokratîk tê bikoşin û bibin hêza çareseriya Sûriyeyê."

*GIRKÊ LEGÊ - ANHA*

## 'Bêyî kurdan çareserî ne pêkan e'

**DESTEYA** Rêveber a Partiya Çep a Kurd li Sûriyeyê diyar kir ku dê civîna Astanayê bê nûnerên rasteqîn ên gelên Sûriyeyê were lidarxistin û serkftina vê civînê ne pêkan e. Di civîna desteya rêveber a partiyê de sekreterê partiyê Salih Gedo hewildanên rejîma Baasê yên parçekirina kurdan û înkarkirina mafên kurdan şermezar kir û têkildarî civîna Astanayê ev tişt anîn ziman: "Tekane rêya çareseriya aloziya Sûriyeyê projeya federaliya demokratîk e. Çareseriya Sûriyeyê bi nûnerên Sûriyeyê re pêkan e. Çareserî bi destê hêzên derve re pêk nayê. Hêzên ku Sûriyeyê dirûxînin. Civîn û kongreya beyî kurdan pêk tê, ne mimkûn e ku bi serkeve." **QAMIŞLO**

## Biryarên Astanayê nas nakin



**CÎGIRA DESTEYA** Têkiliyên Derve ya Kantona Efrînê Cîhan Mihemed da zanîn ku ew li gorî biryarên civîna Astanayê tev nagerin. Cîhan Mihemed da zanîn ku Tirkiye, Îran û Rûsya dixwazin bi civîna Astanayê bigihîjin berjewendiyên xwe û wiha dom kir: "Ev hêz dixwazin hêzên demokratîk ji civînê dûr bixin. Lê serçeteyên faşîst û şovenîst ji vê civînê re hatine vexwendin. Ev civîn tenê xizmeta berjewendiyên hêzên navneteweyî dike. Ne mimkûn e ku ev civîn bi ser keve û em biryarên vê civînê jî qebûl nakin." **EFRÎN**

## Dûrxistina kurdan aloziyê kûr dike



**HEVSEROKÊ** Partiya Aştiya Demokratîk Telal Mihemed diyar kir ku dûrxistina kurdan ji civîna Astanayê, aloziya Sûriyeyê kûrtir dike. Telal Mihemed detnîşan kir ku gelê kurd di aloziya Sûriyeyê de di çarçoveya sîstemeke demokratîk de xwe bi rêxistin kir û ev tişt anîn ziman: "Civînên ku ji bo çareserkirina aloziya Sûriyeyê têne lidarxistin, bêyî beşdariya kurdan bi ser nakevin. Ger ev hêz bixwazin şer raweste û alozî çareser bibe, divê hemû pêkhateyên Sûriyeyê tev li vê civînê bibin. Gelê kurd pergala herî demokratîk ava kir û divê tev li civînê bibin. Dê ev civîn jî mîna ya Cenevreyê têk biçe. Em biryarên vê civînê jî nas nakin." **QAMIŞLO**

# Qonaxa duyemîn ber bi dawiyê ve diçe

Ji fermandarên Odeya Çalakiyan a Xezeba Firatê Rojda Felat da zanîn ku qonaxa duyemîn a hemleya Xezeba Firatê dê heta rizgarkirina bajaroka Tebqayê û dorpêçkirina Reqqayê bidome.

Fermandar Rojda Felat da zanîn ku di qonaxa duyemîn a hemleyê de heta niha 197 gund, bi dehan mezra û qadên stratejîk hatine rizgarkirin û wiha domand: "Qadeke bi qasî 2 hezar û 480 km$^2$ jî hat rizgarkirin. Niha Reqqa ji hêla bakur û rojava ve hatiye dorpêçkirin. Ji bo rizgarkirina Reqqayê rizgarkirina gundewarên wê girîng e."

**NÊZÎ TEBQAYÊ NE**

Di dawiya axaftina xwe de jî Rojda Felat ev tişt anîn ziman: "Di vê qonaxê de armanca me ya herî girîng rizgarkirina keleha Caberê û xwe gihandina çemê Firatê bû. Ev jî bi serkeftî pêk hat. Em hêdî hêdî ber bi Tebqayê ve diçin. Têkçûyîna çeteyan li ber çavan e. Em ji bo rizgariya gelê xwe têdikoşin. Em dê bi ser kevin."



*REQQA - DÎHABER*

## Artêşa tirk êrîşî gundê Kobanê kir

Leşkerên tirk bi çekên giran êrîşî gundên sînor ên Kobanê kir û liv û tevgera xwe ya li ser sînor zêde kiriye.

Li gorî agahiyên ji herêmê, artêşa tirka a dagirker di saetên êvarê ya 18'ê çileyê de bi çekên giran êrîşî mewziyên YPG'ê yên li ser girê Şehîd Hogir ê nêzî gundê Çariqlî kirin. Di heman saetan de jî bi çekên giran êrîşî derdora gundê Til Findir ê dikeve rojhilatê Kobanê kir. Li ser sînorê di navbera Kobanê û bakurê Kurdistanê de liv û tevgera leşkerên tirk zêde bûye. **KOBANÊ - ANHA**

## Şêniyên Şebekê komuna xwe ava kir

Meclisa herêma Çilaxa ya Girkê Legê bi armanca avakirina komuna gundê Şebekê civînek li dar xist. Civîn bi beşdarbûna dehan şêniyên gund pêk hat. Di civînê de Endamê Rêveber ê TEV-DEM'ê Laleş Çiya girîngiya avakirina komunan bi welatiyan re parve kir. Di encama civînê de hevserokên komunê hatin hilbijartin û komîteyên wê hatin avakirin. Civîn bi dirûşmên silavkirina HSD'ê bi dawî bû. **GIRKÊ LEGÊ**

## Qanûna tomarkirina wesayîtan erê kirin

Hevserokatiya Kantona Cizîrê biryarnameya hejmar /2/ a sala 2017'an a der barê erêkirina yasaya tomarkirina wesayîtan de erê kir. Di metnê de wiha hat gotin: "Li gorî hikmên hevpeymana civakî û biryarên Meclisa Zagonsaz ku di civîna xwe ya hejmar /25/ ku di dîroka 17/12/2016'an de hatiye lidarxistin, hatin dayîn, hevserokatiya kantonê biryarnameya yasaya tomarkirina erebeyan erê kir." **GIRKÊ LEGÊ**

www.arsivakurd.org

ROJEVA Medya
20 Çile 2017 În


# YPS'ê mohra xwe li dîrokê xist

**Endamê Komîteya Rêveber a PKK'ê Murat Karayilan got ku YPS'ê pêvajoyeke berxwedanê ku mohra xwe li dîrokê bixe, derxist holê. Karayilan got ku YPS bi ruhê fedayî ava bûye û sala duyemîn a têkoşînê li hemû endamên YPS'ê pîroz kir**

Endamê Komîteya Rêveber a PKK'ê Murat Karayilan da xuyakirin ku çareseriya pirsgirêka kurd di çarçoveya yekitiya Tirkiyeyê de bi modela xweseriya demokratîk pêkan e.

Karayilan wiha axivî: "Ragihandina formula çareseriya xweseriya demokratîk tê wateya destnîşankirina vîneke girîng a çareseriyê. Rêber Apo, xweseriya demokratîk ku dispêre bingeha paradîgmayî, weke şêweyê herî rast ê çareseriyê diyar kiriye. Dema ku mêtîngeriya Tirk xwe neda ber vê çareseriyê û şer da destpêkirin, Meclisên Gel ên Kurdistanê bi feraseteke rast a rêveberiyê, xweseriya demokratîk ragihandin û bi vî rengî gaveke rast û di cih de avêtin." Karayilan da xuyakirin ku li dijî dewleta AKP'ê gelê kurd çareseriya xwe bi xwe nîşan daye û got: "Dema ku Rêber Apo dibêje, 'xweseriya demokratîk, rastiyek e' ev eyk hem ji bo demokratîkbûna Tirkiyeyê, hem jî ji bo çareseriya pirsgirêka Kurd weke rêya yekane destnîşan kiriye. Ev model wê hem Tirkiyeyê demokratîk bike, hem jî çareseriyeke mayînde ya aştiya civakî li Kurdistanê bafirîne."





Karayilan ragihand, AKP ji bo mayîndekirina desthilatdariya xwe û pêkanîna sîstema serokatiyê, bi hemû derfetên dewletê, bi hêza dîplomatîk-siyasî û leşkerî êrîşî bajarên xwerêveberiya demokratîk lê hat ragihandin kir.

Karayilan anî ziman ku YPS bi ruhekî fedayî ava bûye û wiha got: "Tevî ku YPS di demeke kurt de ava bû, berxwedaneke gelekî mezin raber. Vê yekê nîşan da ku siberoja wê ronî ye. Cihê pesindayînê ye ku YPS di nava berxwedana ciwanên Kurdistanê de bi ruhê fedayî yê Apoyî ava bûye."

Karayilan destnîşan kir ku Stratejiya Şerê Gel ê Şoreşger e ku bi berxwedana bajaran û têkoşîna têkoşîna me ketiye meriyetê û wiha got: "Stratejiya şerê Gel ê Şoreşgerî, qonaxeke ku gel dikare li her qonaxa têkoşîna şoreşgerî de tevlî nava têkoşînê bibe. Me ev yek di berxwedana xwerêveberiyên li bajaran dît."

Karayilan da xuyakirin, ku AKP ji vî rihê ciwanên Kurdistanê ditirse, lewma bi pêkanînên li derveyî mirovahiyê faşîzmê mezin dike. Karayilan anî ziman, amûra herî baş a parastinê, rêxistinbûn e û wiha got: "Di roja îro de eger rêxistinbûneke xurt, dîsîplîn û nepenîbûn nebe, tiştek nikare bê kirin. Bi taybetî erka parastinê nebe, ti tişt nikare bê kirin." Karayilan da xuyakirin, ku divê xweseriya demokratîk êdî weke şêweyeke jiyanê bê dîtin. ***BEHDÎNAN - ANF***

## Gel bi xurtî li ber xwe da

**MURAT KARAYILAN** destnîşan kir ku YPS li cihekî, li dora maseyekê yan jî di civîneké de nehatiye ragihandin û anî ziman, YPS'ê berxwedaneke ku mohra xwe li dîrokê bixe derxistiye holê. Karayilan da zanîn ku tevî hemû kêm derfetan û kêmasiyan jî gel bi xurtî li ber xwe da. Karayilan wiha axivî: "Li pêşberî fedakariya bilind a gel û sekna fedayî ya pêşengên rasteqîn ên mîna Mehmet Tunçan, divê mirov rewşa yên ku di dema xwe de bi erka xwe ranebûne jî bibîne. Tevî hemû kêmasiyên derketin holê jî, berxwedana mezin a gelê me, encameke girîng derxist holê."

# 24 rojên binçavkirinê vegotin

Rojnameger Metin Yoksu yê 24 rojan di bin çavan de hat ragirtin û şeva çûyî bi şertê venêrîna edlî serbest hat berdan, 24 rojên di bin çavan de vegotin.

Yoksu anî ziamn ku, 6 rojnamger li hucreyên cuda dihatin ragirtin û got, wan û kesên ji ber Cemaeta Gulenî û DAIŞ'ê htaine binçavkirin xistine heman hucreyan. Yoksu got, ji bo razanên sîngerên hişk dihatin biakaranîn û ji ber toz û gemarê mirov nikaribû di hucreyan de revbigere. Yoksu diyar kir ku, xwarina dihat dayîn jî ne ew xwarin bû ku mirov bikaribe bixwe û got, ji ber xwarina dihat dayîn gelek kes emelî dibûn. Yoksu anî ziman ku, dema wan stran digotin jî rastî mudaxileya polîsan dihatin û got, polîsan tim heqaret li rojnamegeran dikir.

Yoksu anî ziman ku, rojnameger Omer Çelik ê di dema binçavkirinê de hat derbkirin, dema ew anîna Stenbolê jî canê wî diêşiya û ev êş çend rojan domiyaye. Yoksu der barê binçavkirina wan a bi îdiaya "Endamtiya rêxistinê" jî de wiha got: "Em dibînin ku ji ber propagandaya rêxistineke ku tune ye lêpirsîn vekirine. Têkildarî vê li holê tu delîleke berbiçav jî tune ye. Bi delîlên sexte em binçavkirin. Tenê mebesteke vê heye ew jî, astengkirina rojnamegeriya me ye."

Yoksu wiha axivî: "Nûçeçêkirin berpirsiyariya bingehîn a rojnamegeriyê ye. Lêpirsîna nûçeyên me çêkirin hat kirin. Ji ber me nûçeyên têkildarî maîlên Wezîr Albayrak çêkirine em hatin binçavkirin, lê xwediyên maîlan nehatin darizandin. Ji dêvla ku dozger lêpirsîna nûçeyên em çêdikin bike, bila lêpirsîna îdiayên bûne mijara nûçeyên bike." ***STENBOL***

## Hikumet ji rastiyan ditirse

**ROJNAMEGER** Celal Başlangiç têkildarî girtina rojnamegerên ku 24 rojan di bin çavan de man û hatin girtin got: "Ji ber ku îhtîmala referandûmê nêzîk dibe û rojnamegerên ku rastiyan dinivîsînin dibin hedefa îxtîdarê û ew rojnameger tên girtin."

Başlangiç da zanîn ku ew baş dizane ku hikûmet ji boyî çi rojnamegeran ditirse. Başlangiç bi lêv kir ku ji ber ku rojnameger rastiyên civakê dinivîsînin û hikûmet ji vê yekê ditirse û naxwaze pêşiya siyaseta wan a kirêt bê girtin. Başlangiç diyar kir ku nêzikbûna referandûmê tirs xistiye nava dilê îxtîdarê û wiha axivî: "Îhtîmalê referandûmê tirsa rastî nivîsan xistiye nava dilê îktîdarê." STENBOL



## Rojnameger bi lêdanê revandin

Rojnameger Bariş Boyraz ku di demên dawîn de li Enqereyê 2 caran hat binçavkirin, cara sêyemîn bi maşîna spî binçav kirin û piştî gef û lêdanê serbest berdan. Boyraz, li ÎHD'ê gilî kir.

Boyraz têkildarî revandina xwe diyar kir ku kesên ew revand yek jê bejna wî ne dirêj û ne jî kin bû û ruyê wî gewr bû û wiha got: "Du kesên temenê wan di navbera 25-30 salî de bûn. Hatin bi milê min girtin. Gotin 'Tu dê bombe biteqine?' destê min li pişt min zîvirandin. Telefona min ji beriya min derxistin û dan kesekî din ku li Guvenparkê rûniştiye." Boyraz da zanîn ki bi zorê ew li erebeyê siwar kirine û di erebeyê îşkence û çêr li wî kirine. Piştî demekê Boyraz teslîmî ekîbeke din dikin û îcar ekîb rola 'polîsê baş' dilîze û ji wî re dibêjin; 'Me tu xilas kirî' û xwestine sixûriyê bike. Boyraz, anî ziman ku ger tiştek bê serê wî yên ew revandine berpirsiyar in. ENQERE

## Çapameniya azad RANAWESTE

Bi girtina Midûrê Nûçeyan ê DÎHA'ya bi riya KHK'ê hat girtin Omer Çelîk hejmara xebatkarên girtî yên ajansê bû 11. Edîtorê DÎHA'yê Mehmet Alî Ertaş anî ziman ku nûçegihanên wan ji ber bicihanîna rol û mîsyona civakê daye ser milê wan tên girtin û got ku meşa çapemeniya azad bi girtinan ranaweste.

**DENGÊ CIVAKÊ NE**

Ertaş wiha axivî: "Bi girtina nûçegihanan bêguman neyînî pêk tên û li qadan valahî çêdibe. Dibe ku di aliyê fîzîkî û pratîk de neyînî hebe lê aliyê erênî bêhtir e. Girtina rojnamegeran gaveke erênî ye. Ji ber ev nîşan dide ku hevalên me bi rastî rojnameger in û dengê civakê ne. Her wiha ji bo ku rol û mîsyona xwe pêk anîne hatine girtin. Ev jî hêzê dide me." ***AMED***



www.arsivakurdi.org

## Referandûm her kesî eleqedar dike



KENAN KIRKAYA - SELMAN GOZELYUZ - ENQERE - DÎHABER

Hevserokê DBP'ê Kamuran Yuksek li ser hevdîtinên makeqanûnê axivî.

Yuksek diyar kir ku mijara guherandina makeqanûnê û pêvajoya referamdûmê ji bo pêşeroja Tirkiyeyê mijareke girîng e û wiha got: "Dê li Tirkiyeyê pergaleke çawa bê avakirin, ev me hemûyan eleqedar dike. Ji ber vê ye ku em ji nêz ve geşedanên di vî warî de û pêşnûmaya ku tînin dişopînin. Me di demeke kurt de bangewaziyek kir. Hevdîtinên makeqanûnê rawestînin, bila guherîna makeqanûnê ya heyî paşve bê kişandin, heke hûn bi me, HDP û muxalîfên din re hevdîtinan pêk bînin û çarçoveyeke hevpar a careserkirina pirgirêkan derxin, em piştevaniya vê bikin."

Yuksek, li ser derbaskirina pêşniyarnameyê jî rawestiya û wiha axivî: "Wisa dixuye ku dê AKP sererastkirinê paşve nekêşe. Em ê jî êdî heke referandûm pêk bê, li gorî wê nîqaşên xwe bikin. Pêdiviya Tirkiyeyê bi qanûneke bingehîn a nû heye, lê pêdivî bi pergaleke demokratîk heye." Yuksek bi bîr xist ku AKP'î dibêjin "Di rêveberiyê de em dawî li reveberiya duserî tînin" û wiha got: "Wê demê bila di rêvebirina herêmî de jî dawî li pergala rêveberiya duserî bînin, bila walî ji dewrê derkevin û bila kesên hilbijartî rêvebirina mehelî bi rê ve bibin." Yuksek destnîşan kir ku ji ber referandûmê siyasetmedar kurd û endamên partiya wan tên girtin.

# Serkeftin teqez e

**Endamê Komîteya Rêveber a PKK'ê Duran Kalkan anî ziman ku heke di sala 2017'an de bi şêweyekî rast têkoşîna xwerêveberiyan bê meşandin dê teqez serkeftin bê bidestxistin**

Endamê Komîteya Rêveber a PKK'ê Duran Kalkan der barê berxwedana xwerêveberiyan û YPS'ê de nirxandin kirin.

Duran Kalkan di şexsê hevserokên Meclisa Gel a Cizîrê Mehmet Tunç û Asya Yuksel, hevseroka Meclisa Gel a Silopiyayê Pakîze Nayir de hemû şehîdên xwerêveberiyê bi bîr anîn. Kalkan da zanîn ku sala 2015 û 2016'an ji bo gelê kurd salên girîng ên têkoşînê ne û wiha got: "Di encama berxwedana Xwerêveberiyên Demokratîk de faşîzma AKP-MHP'ê, 'plana çong danînê' têk çû. Gelê me di têkoşîna hebûn û azadiyê de serkeftineke girîng bi dest xist. Di sala 2016'an de li çiya, gund, bajar, şev û roj, havîn û zivistanê gel, gerîla û Serokatî berxwedaneke girîng meşand û têkoşîn gihand asta serkeftinê. Ji bo serkeftinê derfet û firsendên mezin hatin bidestxistin. Ger ji azmunên sala 2015 û 2016'an ders were derxistin di sala 2017'an de bi şêweyekî rast têkoşîna xwerêveberiyan bê meşandin dê teqez serkeftin bê bidestxistin."

**DESKEFTIYÊN MEZIN**

Kalkan destnîşan kir ku li Cizîr û Sûrê berxwedanên dîrokî hatin meşandin û wiha axivî: "Gelek tecrube hatin bidestxistin. Bêguman bedelên mezin hatin dayîn. Dikaribû bi têkoşîneke aqilane encam bihata guhertin. Dikaribû bi kêmtir windahiyan deskeftiyên mezintir bi dest bixin. Lê ji ber rewşa fiîlî encameke wiha derket holê. Divê li ser bingeheke rast mijar were nirxandin û ji şaşiyan ders were derxistin da ku di pêvajoyeke nû de amatorî, nezanî li paş were hiştin û di têkoşîna xwerêveberiyên demokratîk de bi profesyonelî, birêxistinî û bi plan kêmasiyan ji holê rakin."



Kalkan da zanîn ku bi taybet jî hêzên YPS'ê dê li gorî rexne û rexnedayînê pratîkê bi pêş bixin û wiha got: "Ciwanên kurd, şervanên azadiyê yên gelê kurd xwedî wê hêzê û îradeyê ne. Divê sala 2017'an bibe sala azadiya Rêber Apo û Kurdistanê. Ez di wê baweriyê de me ku wekî gel û tevger em ê vê pêk bînin." *BEHDÎNAN ANF*

## Tecrîd şermezar kirin



Tecrîda giran ku li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan tê meşandin li rojavayê Kurdistanê û gelek welatên Ewropayê bi çalakiyan hat şermezarkirin.

Meclisên gundên Rojhilatê Kobanê ku li Mala Gel a gundê Bozîk ên rojhilat kom bûn daxuyaniyek der barê tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan de da. Bi dehan şêniyên gundên rojhilatê Kobanê amade bûn. Daxuyanî ji aliyê endamê Meclisa TEV-DEM`ê Ehmed Kinco ve hat xwendin. Kinco wiha got: "Em wek Meclisa Gundên Rojhilatê Kobanê tecrîda li ser Ocalan û kiryarên hov ên AKP`ê şermezar dikin. Em ê bi hemû hêza xwe projeya Federaliya Demokratîk a Bakurê Sûriyê biparêzin û em ê planên li dijî Rojava vala derxin".

Meclisa Malbatên Şehîdan a navçeya Raco ya Kantona Efrînê tecrîd şermezar kir û wiha got: "Destpêkê em tecrîda li ser Rêber Apo bi tundî şermezar dikin. Hikumeta Erdogan hewl dide ku rê li ber belavbûna fikr û ramanên Ocalan bigire da ku navgîna di navbera Rêber û gelê wî de qut bike. Em wek Meclisa Malbatên Şehîdan, soza xwe bi şehîdan û Rêbertiyê re nû dikin û fikr û felsefeya Ocalan a aştiyê û mirovahiyê di nava gelan de belav bikin."

Li bajarê Hannover û Mannheim ên Almanyayê, li bajarê Zurih ê Swîsreyê bi çalakiyan tecrîd hat şermezarkirin. **ANHA -ANF**

## Dê bên ser rêya **Ocalan**


Berdevkê HDP'ê û parlamenterê Qersê Ayhan Bîlgen, geşedanên dawîn ên li Tirkiyeyê nirxandin û diyar kir ku dawiya dawîn dê bên ser rêya Birêz Ocalan ku der barê qanûna bingehîn de hişyar kiribû.



Bîlgen diyar kir ku dê xebatên pêşnûmaya qanûna bingehîn zêdetir bibe û wiha got: "Ger derdekî Tirkiyeyê yê ketina nava şerê navxweyî tune be, dawiya dawîn dê bên ser rêya Birêz Ocalan a ku der barê qanûna bingehîn de hişyar kiribû. Divê ev jî wekî peymana civakê ya ku avakirna vînek nû bê hesibandin. Divê geşedanên rojane, guhertinên li cîhanê, neheqiyên beriya 100 salan hatine kirin ji holê bên rakirin û divê pêvajoyeke cidî ya qanûna bingehîn bê destpêkirin." Bîlgen da zanîn AKP li ser parlamenterên girtî 'şantaja siyasetê' pêk tîne û bi vî rengî planên xwe pêk tîne.

Bîlgen, destnîşan kirin ku ger qanûna bingehîn ji meclisê derbas bibe dê vîna gel bikeve dewrê û wiha axivî: "Gel di vê mijarê de çi qas hestiyar be, çi qas zelal be dê Erdogan û alîgirên wî jî fêm bikin ku çareseriya pirsgirêkê di riya qanûna bingehîn a demokratîk re derbas dibe. Rêyeke din tune ye. Ger dawiya dawîn dê biçin ser vê rêyê, divê lez bikin û ev yek peywira siyasetê ye, berpirsyariya saziya siyasetê ya li dijî gel e. Rêya çûyîna qanûna bingehîn a demokratîk û aştiyane di Îmraliyê re derbas dibe. Her çi qas Birêz Ocalan bê tecrîdkirin jî hişyariyên berê kirine hatine qeydkirin. Her çi qas naxwazin van hişyariyan bînin bîra civakê jî, di rastiyê de riya rast a xwe gihandina aştiyê di avakirina bingeha diyalogê re derbas dibe, cîhan hemû û Tirkiye vê yekê dizane." ***ÎZMÎR***





## 'Rizgarî bi yekitiyê pêkan e'

Endamê Lijneya Rêveberiya PDK-S'yê Ali Al Muslem bal kişand ser nîqaşên yekitiya neteweyî ya kurd û anî ziman ku heke vînek derkeve holê dê yekitiya netewî ya kurd pêk bê.

Xwediyê Weşanxaneya Komalê ya di salê 90'î de faaliyetên xwe dimeşandin Huseyin Avci jî got, pêdiviya gelê kurd bi yekitiya neteweyî heye. Avci anî ziman ku, wek 4 parçeyan dabeşkirina erdnîgariya kurdan dagirkerî zêde kiriye û wiha axivî: "Heke ev perçebûyîna me bidome, dê rewşa me ya dagiriyê bidome. Madem dabeşkirina me em dagir kirin, ew çax divê em bigihîjin hev û serxwebûna welatê xwe îlan bikin. Bi mantiqê bila biçûk be lê ya min be, em negihîjin hev û heke wisa bidome dê asta me ya dagiriyê bidome. Em dikarin hev rexne bikin û lêpirsînan bikin, lê divê em bi hev re tev bigerin. Rizgariya gelê kurd bi yekitiya neteweyî pêkan e." **MÊRSÎN**



ROJEVA Medya
20 Çile 2017 În

# Ditirsin!

Cumaalî Dogan

Ji kurdan ditirsin. Ditirsin ku sedsala 21'emîn bibe sedsala kurdan. Ji ber ku ew jî dibînin her ku kurd bi ser dikevin ew ber bi tunebûnê ve diçin. Di esasê xwe de yên ji kurdan ditirsin, ji xwe ditirsin. Kesên ji kurdan ditirsin ji ber ku hebûna xwe di ser tunekirina kurdan re heyî dikin, ditirsin.

Kesên dijberiya Hêzên Demokrasî û Azadiya Kurdan û têkoşîna wan dikin, hemû dijberiya xwe li ser vê tirsê çêdikin. Ji ber wê yekê ye ku ev hêza ku jê ditirsin çi qas xurt dibe, çi qas destkeftiyên nû bi dest dixe; wekî berfa tavê lê xistî yan jî wekî rûnê li ser agir dihelin. Ji ber vê yekê ye ku li ser navê kurdîtiyê çi hebe dema ku çav pê dikevin dîn û har dibin û êrîş dikinê. Dixwazin wê tune bikin. Heta ew çend êrîş dikin ku dixwazin li ser navê kurdîtiyê çi hebe tune bibe.

Dîroka kurdan tune dikin. Heta duh pêra hanê ev yek bi lêkirina bend û bendavan, bi lêkirina avahî û kargehên bilind, bi xerakirin û wêrankirinê, bi rêya herêmên qedexe dikirin, pêk dianî. Îro ro jî heman tiştî dikin. Lê belê pêkanînên xwe bi yên duh û pêr bi sînor nakin. Li herêmên berxwedanê yên wekî Sûr, Cizîr, Şirnex, Nisêbîn, Silopî, Farqîn, Gever û yên din kevir li ser kevirî nahêlin û wêran dikin. Bi vî awayî di warê dîrok, çand û civakê de bi rastiya van herêman dilîzin, avahîsaziya li van herêman xera dikin û dixwazin tune bikin.

Bi vê awayî dipên ku li ser navê kurdîtiyê ew ê tune bikin. Dipên ku dema mexseda xwe bibin serî; daneheva bi hezaran salan a xweza, dîrok û wan herêman, ziman û mîrateya wan a ku xwe gihandiye îro û ew ê ji siberojan re bimîne jî dê tune bibe û were jibîrkirin!

Dema vê yekê pêk tînin jî ders û encam ji dîrok û ji hemtayên xwe yên ku heman tişt kirin, nagirin. Gotin di cih de be wekî Mîdasê Guhker dipên ku guhê xwe yê dirêj di bin kumê datînin serê xwe dê veşêrin.

Li bendê ne ku her kes ji wan bawer bike û li gorî van tev bigere. Ji pêkanînên xwe rû dibînin û zêdegaviyê dikin; dibêjin; "Kurd û Kurdistan tune ye." Dema vê yekê dibêjin jî çawa ku duh "heramzadeyên koka xwe înkar dike" ew jî îro ro heman kesan bi kar tînin. Wan datînin kêleka xwe. Wekî parçeyekî xişt û zînetê wan bi xwe ve dikin. Heta hebûna wan kesan wekî hincet nîşan didin û hewl didin ku eletewşiya xwe rewa bikin. Heta gavine zêdetir diavêjin, xwe dispêrin 'heramzadeyan', ji devê wan dixwazin ku hebûna kurdan bidin înkarkirin.

Encax li gel hemû hewldanên xwe jî bi polîtîkayên xwe yên înkar û îmhayê nikarin encamê bi dest bixin. Dikin û nakin "roj bi bêjingê nayê girtin." Jixwe qeweta wan jî têrê nake. Li hemberî tîn û germa sotîner a rojê tevî hevkarên xwe diqijilin, xurxurî dibin. Êrîşê rojavayê Kurdistanê dikin, dixwazin jiyana azad û demokartîk a tê pêşxistin, bifetisînin. Dixwazin destkeftiyên kurdên başûrê Kurdistanê jî tune bikin. Destkeftiyên bakurê Kurdistanê jî ku bi bedelên mezin hatine bidestxistin, tune dihesibînin û ji bo ku kurd li destkeftiyan xwedî dernekevin êrîşên xwe yên qirkeriya mêtinger zêdetir dikin.

Ji bo sedsala 21'an nebe sedsala kurdan, hemû xebatên ji bo yekitiya neteweyî û kongreya neteweyî asteng dikin. Ji bo vê yekê asteng bikin çi dema ku kurd ji bo çareserkirina pirsgirêkên li pêşiya yekitiyê gav biavêjin, dest bi êrîşan dikin. Fitne-fesadê dixin nav kurdan. Li gorî wan "du kurd nikarin werin gel hev" dema werin gel hev jî "dê şerê hev bikin", ew dixwazin wisa bawer bikin û ji bo ev yek pêk were jî her tiştî dikin.

Van hemûyan jî ji ber tirsa nav dilê xwe dikin. Ew baş pê dizanin, dibînin ku lehiya bi Bihara Kurdan bilind bibe dê wan bi xwe re bibe. Gelê Kurdistanê û dostên kurdan vê yekê dibînin. Baş pê dizanin ku "ew pêla binvebinve bilind dibe" dê hemû dijminên kurdan, êrîşên qirkeriya mêtinger hemûyan bide ber xwe û bibe. Bi vê zanebûnê û bi kelecaneke mezin li benda Bihara Kurdan in.

Jixwe ev rastî bi xwe ye ku dijminên kurdan jî, kes û kûsên bi wan re di nav hevkariyeke bêyom de ne jî, derdorên ku êrîşên qirkeriya mêtinger bilind dikin jî dike ku ev derdor hemû bi dîn û harbûna xwe nizanin bê ka êdî çi bikin.

Her ku Bihara Kurdan nêz dibe dê dîn û hartir bibin. Av û şetên ku bi biharê re zêde û bilind dibin, ji bo ku bend û bendavên li ber xwe tune nekin, dê êrîşên xwe yên qirkirinê zêdetir bikin. Lê belê dê ev yek bi tenê dawiya wan nêztir bike.

Ew çi jî bikin, ew herin erş û werin ser ferş jî, tişta ku jê ditirsin dê were serê wan. Dê sedsala 21'an bibe sedsala kurdan. Gelê kurd bi parastina destkeftiyên xwe yên bi bedelên mezin bi dest xistine, bi ser keve û bi bihara ku wekî sersala wan dê kurd wekî av û çeman bicoşin.

# 'YPS'ê artêşa tirk têk bir'

Şervanên YPS'ê di salvegera yekemîn a damezirandina YPS'ê de destnîşan kir ku heta azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û gelê kurd dê têkoşîna wan bidome.

**Bi boneya 1'emîn salvegera damezirandina YPS'ê şervanên YPS'ê diyar kir ku bi berxwedana YPS'ê dewleta tirk têk çûye û bang li ciwanan kir ku li hemberî êrîşan bila tev li refên YPS'ê bibin**



Dewleta tirk di 24'ê tîrmeha 2015'an de operasyoneke mezin a hewayî li dijî Herêmên Parastinê yên Medyayê pêk anî û piştre jî êrîşî Xwerêvebeiryên Demokratîk ên di 10'ê tebaxa 2015'an de hatin ragihandin, kir. Di çarçoveya êrîşan de bi dehan bajarên kurdan hatin rûxandin. Li dijî van êrîşên tunekirinê jî ciwanên kurd di 19'ê çileya 2016'an de Yekîneyên Parastina Sivîl (YPS) ava kir û bi berxwedaneke mezin bersiv da êrîşan.

Der barê mijarê de şervanê YPS'ê Cûma Azad di şexsê hemû şehîdên YPS'ê de salvegera damezirandina YPS'ê li Rêbertiyê, gelên Kurdistanê û hemû şehîdan pîroz kir. Azad da xuyakirin ku wan bi bandora ruh, coş û moralê Apoyî YPS ava kiriye. Azad diyar kir ku dewleta tirk bi teknîk û çekên giran xwest berxwedanê têk bibe lê wan bi berxwedana xwe gelê xwe parastiye. Azad axaftina xwe wiha domand: "Nedikarîn hêzên me têk bibin. Ji bo vê jî dest bi bikaranîna hemû cureyên çekên giran kirin û bajar rûxandin. Lê YPS'ê di cih de bersiv da û gelek leşkerên tirk hatin kuştin û psîkolojiya wan têk çû. Di serî de Hezex divê gelê me xwedî li vê têkoşînê derkeve."

## YPS'Ê PÊŞÎ LI GIRT

Şervanê YPS'ê Hêvî Erdal jî da zanîn ku ew li Nisêbînê berxwedana gel, xendek û bendên li dijî dewletê bi bandor bûbûn û wiha dom kir: "Coş, kelecan, moral û keda zarok, dayik û kalan bandoreke mezin li ser min kir. Ev berxwedana nîşaneya bêtehemûliya li dijî komkujiyan bû. Li dijî êrîşên tunekirinê gelê kurd xwe di nava YPS'ê de bi rêxistin kir û pêşiya dewletê girt. Berxwedana hevalan artêşa tirk şikand. Gelê me bi berxwedana bajaran destanek nivîsand. Tirkiye li hemberî fedayîtiya hevalên me yên şehîd bi bin ket. Em wek şopdarên şehîdan û gelê xwe, dê xwedî li vê berxwedanê derkevin û ez banga tevlîbûnê li ciwanên kurd dikim."

## ŞEHÎD BI BÎR ANÎN

Pale Nisêbîn jî damezirandina YPS'ê li Rêbertî û şehîdan pîroz kir û wiha pê de çû: "Bi vê wesîleyê ez hemû şehîdan jî bi rêzdarî bi bîr tînim. Ragihandina YPS'ê ji bo me mîladek e. Bi berxwedana bajaran planên tunekirinê têk çûn. Dewleta ku dixwest serî bide tewandin, kete rewşa sertewandine. Ya ku ev rewş afirandibû jî têkoşîna Pakîze, Sêvê, Mehmet Tûnç, Xebat, Binevş û gelê me bû. Vê berxwedanê tirs berda dilê dijmin. Ji ber vê yekê gotin 'Em ê xanî li ser pêyan, serî li ser milan nehêlin' û bi rengekî êrîşî Nisêbînê kirin. Ji ber ku ev bi ser nexistin, vê carê bi hev ketin. Ev yek jî bi saya têkoşîna Xeyriyan pêk hat. Hevalê Xeyrî digot, 'çavekî me, destekî me, lingekî me jî bimîne em ê nesekinin, em ê li ber xwe bidin'. Vê gotin û helwestê dijmin xist vî halî. Hevalên me yên birîndar, tevî birînên xwe çeperên xwe parastin. Ciwanan di têkoşîna li dijî JOH û POH'ê de destaneke dîrokî nivîsand. Vî ruhî Sendroma Nisêbînê li dijmin da jiyandin."

## COŞA MEZIN A GEL

Cahît Amed jî di destpêka axaftina xwe de salvegera damezirandina YPS'ê li Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan û gelên Kurdistanê pîroz kir û axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Piştî ez tev li berxwedana YPS'ê bûm, ez derbasî Sûrê bûm. Dewleta tirk piştî ragihandina YPS'ê ji Gimgimê heta Cizîrê li her derê dest bi pêleke giran a êrîşê kir. Li dijî van êrîşên tunekirinê yên dijmin, berxwedaneke dîrokî hat nîşandan. Gelê me jî ji ber berxwedana ciwanên kurd, ket nava coş û kelecaneke mezin. Gelê kurd bi vê coş û kelecanê tev li berxwedana bajaran bû. Ev berxwedana me ya dîrokî dewam dike. Bang li hemû ciwanên kurd dikim ku cihê xwe di nava YPS'ê de bigirin û vê berxwedanê mezin bikin."

*BOTAN - ANF*

## 'Nekevin xefika şerê taybet'


**ŞERVANÊ YPS'Ê** Çayan Koçgirî salvegera damezirandina YPS'ê di şexsê şehîdan de li gelê kurd pîroz kir û diyar kir ku damezirandina YPS'ê ji hêla gelê kurd ve bi coş û heyecan hat pêşwazîkirin.



Koçgirî di berdewamê de jî ev nirxandin kir: "Gelê me jî di pêvajoyeke bi vî rengî de destek da zarokên xwe û berxwedan mezin kir. Bi berxwedana xwe jî nîşan da ku wê xwe bi rê ve bibe û xwe biparêze. Ji komkujiyên Tirkiyeyê re jî gotin bes e. Dewlet bi vê tirsiya û bi çeteyên xwe êrîş kir. Hêzên ku li Cizîrê komkujî kirin, anîn Hezexê û bi vî rengî xwestin berxwedanê têk bibin. Lê tevî van êrîşan, lehengî û fedaîtiyeke mezin derket. Derbên giran xwarin û ji bo vê jî serî li teknîkê dan. Bêguman rêbaza şerê wan ji sedî 90 şerê taybet û ji sedî 10 jî teknîk e. Li Hezexê yên ku ji bo wan şer bikin tune bûn. Divê gelê me nekeve nava xefika şerê taybet. Divê gelê me birînên xwe bipêçe û ciwan jî tev li hêzên me bibin."

## Heta azadiyê berxwedan

**ŞERVANA YPS'Ê** Nûjiyan Nisêbîn jî salvegera YPS'ê pîroz kir û nêrînên xwe wiha anîn ziman: "Dema ku şerê taybet û êrîşên tunekirinê giran bûn ez li Nisêbînê tev lê bûm. Gelê me li dijî van êrîşan serî netewand û ez jî tev li vê berxwedana birûmet bûm. Ev berxwedana me dê heta azadiya Rêbertiya me û gelê me bidome. Ez bang li ciwanan dikim ku tev li YPS'ê bibin û berxwedanê mezintir bikin."





## Neviya xwe Arînê bi stranan mezin dike

**DENGBÊJ MERYEM TUNCER** da zanîn ku dengbêjî parçeyek ji çanda kurdan e bi saya serê jinan xwe gihandiye heta nifşên îro û neviya xwe ya bi navê Arîn Mîrkan jî bi stranên dengbêjiyê mezin dike. Dengbêj Meryem Tuncer a 41 salî ji biçûkatiya xwe heta niha bûye şahidê gelek bûyerên li Kurdistanê pêk hatine û ji ber vê êşa ku dîtiye, kilam gotine û êşa xwe bi kilaman aniye ziman. Dengbêj Meryem da zanîn ku zarokên xwe bi kilaman mezin kirine û neviya xwe Arîn Mîrkanê jî bi vî awayî mezin dike. **WAN - ŞÛJIN**



# *'Peyakî bênav û nîşan';* Reşîdê Kurd



**49 sal ango nîvsedsalek di ser wefata helbestvan û helwestkarê hêja yê kurd Reşîdê Kurd re derbas bûn lê îro jî bi kar û barên xwe yên di warê wêje û rêzimana kurdî de deriyên nû li ber kurdîhezan vedike**

NAVENDA NÛÇEYAN

Civaknasê ereb Îbnî Haldun di pirtûka xwe ya bi navê 'Muqaddîme' de dibêje; mirov dişibe axa lê ji dayik bûye. Helbestvanê tirk Cemal Surreya jî di helbesteke xwe de dibêje; "mirov dişibe bajarên welatê xwe, dişibe masiyên di çemên xwe de…" Helbet ev pênaseyên determînîstî ne lê aliyê wan ê rast jî gelek e. Helbestvanê gewre yê kurd Reşîdê Kurd ê ji Dêrika Mêrdînê ye û hema bêje hemû xisletên welatê xwe di ruh û giyanê xwe de, di helbest û karên xwe de dihundirîne. Her çend ku beriya 49 salan ji vê dinyaya kambax konê xwe bar kiribe û çûbe ebediyetê jî bi xebatên xwe yên rewşenbîrî her di dil û mêjiyê kurdan de ye.

Helbestvan e û bi qasî helbestvan, zimanzan e jî. Hem di warê helbestê de hem jî di warê rêzimanê de xwedî berhem e. Reşîdê Kurd 4 sal beriya Şerê Cîhanê yê Yekemîn ku welatê wî Kurdistan di encamê de dibe 4 parçe, tê dinê, di nav germegerma Şerê Cîhanê yê Duyemîn de jî derbasî 'Binxetê' dibe. Helbestvanê hêja tam jî di neqeba pêşketina bayê Şoreşa Gulanê de di 20'ê çileyê de jiyana xwe ji dest dide lê di helbestên wî de dengê şoreşê bilind dibe.

**JÎNENÎGARIYA WÎ**

Reşîdê Kurd di sala 1910'an de li gundê Rewşatê yê Dêrika Mêrdînê tê dinê. Ew xwendina xwe li Dêrika Mêrdînê û salekê jî li Konyayê temam dike. Wekî her kurdekî welatperwer û birûmet ji bo nasname, çand û zimanê xwe tê dikoşe. Piştî qedandina xwendina mamostetiyê ya sala 1930'î bi çend mehan ji ber xwedî li kurdewariya xwe derdikeve tê girtin lê ew ji girtîgehê direve. Ew di 1940'an de derbasî Sûriyeyê dibe û piştî demekê li bajarê Amûdê yê rojavayê Kurdistanê bi cih dibe. Reşîdê Kurd ji bo pêşxistina ziman li gel xebata rêzimanî ji bo wêjeya kurdî jî ked daye. Reşîdê Kurd helbestvanekî kurd e lê belê ew bêhtir bi xebatên xwe yên rêzimanî li ser zimanê kurdî tê naskirin.

**HESRETA DÊRIKÊ**

Jiyana Reşîdê Kurd jî wekî her niştimanperwerekî kurd di nav siyaset, zor û zehmetê, di nav zindan û sirgûnkirinê de derbas dibe. Ji bo azadiya kurdan têkoşîneke mezin dide. Ew di sala 1949'an de bi nexweşiya kezebê dikeve. Bi salan li dijî vê nexweşiyê tê dikoşe. Her tim dixwest ku li Kurdistaneke azad bijî. Armanca wî rojekê vegere ser axa ku jê dayik bûye yanî vegere Dêrika Çiyayê Mazî. Roj bi roj nexweşî lê giran dibe. Reşîdê Kurd beriya ku jiyana xwe ji dest bide dibêje: "Pir kar û barên min hene ku ez bikim, min ew hê nebirine serî. Na gerek ez niha nemirim. Gerek ez vegerim baxçeyên Dêrikê, ku min ji mêj ve bêriya wan kiriye, paşê bila mirin were." Lê nekarî vegere û di 20'ê Çileya sala 1968'an de çû ser dilovaniya xwe.

Reşîdê Kurd ê ku gelek helbestên hêja nivîsîne, bi zimanekî sade lê modern û ceribînên nû deriyên nû li ber helbesta kurdî vekirine ku gelek bandor li nifşên li dû xwe jî kirine. Yek ji helbestên wî yên navdar jî 'Ez' e.

### Ez

Bextiyar im, bextiyar im
Çunkî ez proleter im
Peyakî bênav û nîşan im
Ji wê ordiya canbêzar im
Di meydana azadî de
Rapêçayî, her li kar im
Heya sax bim ez giranbar im
Ji xweşiya jînê loma
Destşûştî, bê pişk û par im
Serxweş nabim bi şabaşan
Pesinkaran re neyar im
Ser danînim ji pûtan re
Pûtşikênkî çi dijwar im.



## Ferhenga japonî-kurdî amade ye

Vakkas Çolak ê çîrokên japonî wergerandine kurdî û kursa zimanê kurdî dide japonan, ferhena japonî-kurdî amade kir. Çolak ku niha li ser rêzimana kurdî dixebite û pirtûkan amade dike, destnîşan kir ku ew dixwaze li Japonyayê enstîtuyeke kurdî veke. Çolak ê ku ji Zanîngeha Dîcleyê destûrnameya xwe wergirtiye, destnîşan dike ku dê di meha adarê de ferhenga wî were çapkirin. Yek ji armancên Çolak jî ew e ku li zanîngeheke Japonyayê dersên kurdî bide xwendekaran. **TOKYO**




## Berendamên Siyadê diyar bûn

Komeleya Nivîskarên Sînemayê (Siyad) ji fîlmên sala 2016'an di 11 waran de berendamên Xelatên Siyadê aşkera kirin. Fîlmên ku par ketine vîzyonê di warê fîlmê herî serketî, derhêner, senaryo jî di nav de di 11 waran de dê bi hev re bikevin pêşbaziyê. Di nav fîlmên metrajdirêj de fîlmê "Ana Yurdu" ê derhêner Senem Tuzen di 8 waran de bûye berendam ku herî zêde wî fîlmî berendam bi dest xistine. Piştî wî fîlmê "Tereddut" tê ku di 7 waran de bûye berendam. 15'ê adara 2017'an li Navenda Çanda Bajar a Cemîl Candaş a Şaredariya Şîşliyê bi merasimekê dê xelat bên dayîn. **STENBOL**



## Hejmara nû ya Psychology Kurdî derket

Psychology Kurdî ku yekemîn kovara psîkolojîk a bi kurdî ye, hejmara wê ya duyemîn çap bû. Kovara ku di hejmara xwe ya yekemîn de li ser mijara 'Zarok, Şer û Travma' rawestabû, niha jî bi mijara "Derûndermaniya Trawmayê" radibe. Di vê hejmarê de bi giranî nivîsên li ser tedawîkirina rêyên travmayê hene. Nemazê di rewşen derasayî û acîl de divê malbat, derdor, mamoste û kesên pispor bi zarokan re divê çawa bikevin têkîliyê, bi nivîsan berfireh kiriye. **AMED**




## *Li Amedê şevbêrka dengbêjan*

Li Amedê bi pêşengiya Koma Şanoya Şibakê ku bi dirûşma "Nêrînên azad nîşandana azad" ji aliyê komeke şanoger ve hat avakirin, şevbêrka dengbêjan hat lidarxistin. Şevbêrka dengbêjan, li avahiya Şanoya Şibakê ya li taxa Ofîsê ya navçeya Yenîşehîrê hat lidarxistin.

Dengbêj Mizaferê Celdekî û gelek şanohez beşdarî şevbuhêrkê bûn û eleqeyeke mezin nîşanî şevbuhêrkê da.

**ÇÎROKA REŞÎD PAŞA**

Şevberk ji aliyê Dengbêj Mizaferê Celdekî ve bi vegotina çîroka Reşîd Paşa kurê Mîrê Heyalî dest pê kir.




Celdekî bi gotina "Carek ji caran, rehmet li dê û bavê hazir û guhdaran, ji xeynî fesad û awanê dev û dora dîwaran" dest bi çîrokê kir. Di çîroka hat vegotin de, ciranekî Mîrê Heyalî heye û rewşa wî her ku diçe bi xeter dibe û êdî nikare debara xwe bike. Ev kes ji bo ku debera xwe bike, ji Mîrê Heyalî daxwaza ked ango karekî wekî gavantî û şivantiyê dike. Mîrê Heyalî ji gavantiyê dide vî kesî û çîrok wisa didome. Celdekî carinan çîrok bi awayê stranî vegot. Şevbuhêrk heta derengiya şevê berdewam kir û bi çîrokê bi dawî bû. **AMED - DÎHABER**

## Li Germiyanê pêşangeha wêneyan

Li navenda perwerdeya Zankoya Germiyanê ya beşa kurdî pêşangeheke wêneyan hat vekirin. Di vekirina pêşangehê de serokê beşa kurdî ya Zankoya Germiyanê û amadekarê pêşangehê Dara Hemîd axivî û wiha got: "Bi armanca xizmetkirin û girîngîdayîna çand û hunera kurdî me xebateke wiha da destpêkirin. Her wisa ji bo pêşxistina asta zanistî û rewşenbîriya xwendakaran û arambexşiyê jî me girîng dît ku xebateke wisa bikin. Bi taybetî ji bo ciwan ji tiştên neyînî yên li herêma Kurdistanê diqewimin dûr bikevin, xebatên wiha girîng in." Hemîd got ku di pêşangehê de ji xeynî tabloyên zankoyê, 30 tablo xwedekarên Peymangeha Hunera Ciwan a bajaroka Kufrî jî tên pêşandan.

**GERMIYAN - ROJNEWS**



www.arsivakurdi.org



# Kileya şorişî: ŞÊXMEQSUD

Pêlê şorişî ke 15ê adara 2011 de Sûrîye de dêst pêkerdbî, 2012 de heme welat de vila bîbî. Semedo ke Heleb hetê xeylê hêzan ra cayêko stratejîk ameyêne dîyayîş, şarê bajarî hêzê xo yê cewherî awan kerdî û pawitişê xo kerdî.

Kurdî zî tîya de heme çîyê ke heta nika kom kerdbî açarnayî hêzê şorişî. Taxê Şêxmeqsud û Eşrefîye ke zafaneyê înan kurd î, nê cayan de vera heme hêrişan de hetêk ra pawitişê xo kerdêne û hetêk ra zî bingeyê sîstemê cuya ortax eştêne.

Kurdan tena Rojawanê Kurdistanî de nê, **bajarê Helebî de taxê Şêxmeqsud û Eşrefîye de zî hêzê xo yê cewherî ronayî û hêzê xo yê xopawitişî awan kerdî.**
Bi no hawa rayberîya şorişî kerdî

**AWANKERDIŞÊ ERJ**

Serra 2011 de şarê Helebî bitaybetî zî taxê Şêxmeqsud û Eşrefîye dest bi xebatê rêxistinbîyayîş û awankerdişê sazîyan kerdî. Êlula 2011 de Merkezê Kultur û Hunerê Demokratîke taxa Şêxmeqsud de ame awankerdiş û na sazî zî sazîya yewine ke amebî awankerdiş, bîye.

Teşrîna verêne de zî bi beşdarbîyayîşê hezaran kesan taxa Şêxmeqsud û Eşrefîye de meclîsê şarî ameyî awankerdiş. Dima ra meclîsê her di taxan bin banê meclîsê berzêr de bîyî yewe û beşdarê Meclîsê Şarî yê Rojawanê Kurdistanî (MGRK) bîyî. Weçînayîşê MGRKyî de Sînem Mehemede ke taxa Eşrefîye de roniştêne û nika zî temsîlkara Îdareya Xoserîya Demokratîke ya Ewropa ya, bîye sereka meclîsî.

**ŞEHÎDA YEWINE**

Çeteyê rejîmê Sûrîye vera averşîyayîşê ke taxê Şêxmeqsud û Eşrefîye de bîyênê, dest bi hêrişan kerdî. Çeteyêk rejîmî yê keyeyê Ehmet Subhî El-Bekarî ra, adara 2012 de hêrişê firinê nanî yê taxa Eşrefîye kerd. Netîceyê hêrişî de Endama Yekîtîya Stare Gulê Semo sereyê xo ra birîndar bîye û 13ê adare de Nêweşxaneyê Henanî yê taxa Eşrefîye de resaye şehadet.

Şarê Helebî cenazeya Gulê Selmo bi merasîmêko qelebalix dewa Qetme ya Efrînî de defin kerd. Hêrişî ra dima şar komîteyê xo yê xopawitişî awan kerdî û bi dare û sîlehê şenikan pawitişê xo kerdî. Dima ra bi xoverdayîşêko gird çeteyanê rejîmî taxa xo ra vetî.

**HÊZÊ PAWITIŞÎ**

Bi hîrabîyayîşê çalakîyê şorişî ra dima şarê taxa Eşrefîye temmuza 2012 de hêzê xo yê xopawitişî bi nameyê Tugaya Şehîdê Eşrefîye awan kerdî. Hewteyêk ra dima zî taxa Şêxmeqsud de Tugaya Xoverdayîşê Şêxmeqsudî ameye awankerdiş.

Wexto ke 19ê temmuza 2012 de Kobanê de Şorişê Rojawanî dest pêkerd û Yewîya Pawitişê Şarî (YPG) ameye îlankerdiş, hêzê xopawitişê ke taxê Eşrefîye û Şêxmeqsudî de ameybî awankerdiş, beşdarê YPGyî bîyî. Rojawan de hîrabîyayîşê pêlê şorişî ra dima, hêzê rejîmî taxanê Eşrefîye û Şêxmeqsudî ra ameyî vetiş.

**HEYFÊ XO GIREWTÎ**

Eşrefîye û Şêxmeqsud de kurdî xeta xo ya xopawitişî awan kerdbî, labelê beşê bînî yê bajar de mabênê hêzê rejîmî û grûbê Opozîsyonê Sûrîye de şer qewimîyayêne. Nê şeran ver serra 2012 de arişê taxanê bajarî qedîya û taxê Şêxmeqsud û Eşrefîye zî nêyî ra para xo girewtî.

Meclîsê Şarî yê Taxa Eşrefîye û Şêxmeqsudî seba peydakerdişê arişî, kamyonê xo hetê komîteyê hêzê xopawitişê şarî de erşawitî arêyêko nêzdîyê rasteyê teyarayan yê ke nizdîyê bajarê Helebî de yo. Labelê tîya de hêzê rejîmî gule reşanayî kamyonî ser de û 3 endamê komiteyî şehîd bîyî û 10 kesî zî birîndar bîyî.

YPGyî seba ke cewab bido nê hêrişî 27ê temmuza 2013 de vera 2 yewîya hêzê rejîmî ke wexto ke kewtênê herêma Seken El-Şebabî, çatrayîrê Cendul û herêma Şiqêfî ya taxa Şêxmeqsudî de çalakî viraşt. Netîceyê çalakî de 20 endamê rejîmî ameyî kiştiş.

Hêzê rejîmî payîzê 2012 de bi 2 fuzeyan hêrişê suka Sebzeyan ke nizdîyê Camîyê Marûfî yê Şêxmeqsudî yo, kerd. Netîceyê hêrişî de 20 sîvîlî ameyî kiştiş.

Na vîste de Temsîlkarê Taybet yê Miletê Yewbîyaye yê Sûrîye El-Exder El-Îbrahîmî dîyar kerd ke seba Roşanê Qurbanî, mabênê 26 û 30ê teşrîna verêne ya 2012 de adirbest ameyo îlankerdiş. Labelê adirbest taxa Şêxmeqsudî de nêkewt meriyet; çimkî çeteyan hêrişê taxe kerd. Grûba bi nameyê Tabûrê Selahaddînî derbazî taxa Eşrefîye bîye û dima ra zî hewl daye ke derbazî Şêxmeqsudî bibî.

Şarê ke nê taxan de roniştêne, reaksîyonê xo nîşan dayî û çalakî viraştî. Wexto ke çalakvanan 500 metre nizdîyê Grûba Tabûrê Selahaddînî bîye, endamanê grûbe gule reşanayî çalakvanan ser de û netîceyê reşanayîşê guleyan de bi desan çalakvanî şehîd bîyî. Rojêk dima ra hêzê rejîmî û çekdarê Opozîsyonê Sûrîye hêrişê Şêxmeqsudî kerdî û 14 sîvîlî şehîd bîyî û bi desan sîvîlî zî birîndar bîyî. Şervanê YPGyî reyna cewabêko gird da û her di hetan zî taxan ra dûrî kerd...

***HELEB - ANHA***
***(Do bidomîyo)***

## Fermandarê xo pêşwazî kerdî

**WEXTO KE ŞARÊ herême rêxistinîya xo aver berdêne, awankarê Yewîyê Pawitişê Şarî (YPG) Xebat Dêrik bajarê Qamişlo de netîceyê hêrişêko xayîn de bi hawayo giran birîndar bîbî. Şarê seba ke tedawî bikerî Xebat Dêrik berdî Nêweşxaneyê Osmanî yê ke taxa Eşrefîye de bî. Badê ke xebere vila bîye, bi seyan kurdê ke Heleb de mendêne, nêweşxaneyî ver de kom bîyî û hewteyêk ra zêde dormeyê nêweşxaneyî de nobete tepiştî. Labelê her çiqas ke doktorî çi destê înan ra ame kerdî zî, Xebat Dêrik 14ê Çileyê 2012 de resa şehadet. Cenazeya Fermandar Xebat Dêrik, cayêko ameyo dinya, yanî Dêrik de bi merasîmêko gird ame de'nkerdiş. Bi deshezaran şarê Eşrefîye û Şêxmeqsudî zî beşdarê oxirkerdişê cenazeya fermandarê xo bîyî.**





## Vera hêrişan de xoverdayîşêko gird

**ÇETEYANÊ REJÎMÎ 10Ê NÎSANA 2012 de reyna hêrişê taxa Eşrefîye kerdî û 2 sîvîlî kiştî û 5 kesî zî birîndar kerdî. Hêrişî ra dima bi seyan ciwanê kurd yê ke taxa Eşrefîye de herêma Sêkoşe de kom bîyî û çalakî viraştî. Çeteyê rejîmî hêrişê çalaki kerdî, labelê ciwanan xoverdayîşêko gird nîşan dayî û çeteyî mecbûr mendî ke xo peyser biancî.**

**8 û 10ê gulana 2012 de hêzê rejîmî bi çeteyanê xo na rey hêrişê sûka Sebzeyan ya Şêxmeqsudî kerdî. Netîceyê hêrişî de cinîyêk û 2 ciwanî ameyî qetilkerdiş, kesêk zî birîndar bî. Ciwanê kurdî ke komîteyê xo yê xopawitişî awan kerdbî, taxa Şêxmeqsud de xoverdayîşêko qehremanî nîşan dayî. Meşîyayîşê ciwanan bi saetan dewam kerd û resa herêma Seken El-Şebabî ya taxa Eşrefîye. Şero ke tîya de dest pêkerd, netîceyê nê şerî de bi desan çeteyê rejîmî ameyî kiştiş û yê bînî zî remayî.**

**Zifqêre**

## Eke kurdî nêbîy çareserî nêbena



Emrah Kelekçîer

Yeno vatiş ke 23ê çileyî de paytextê Kazakistanî Astana de seba ke qederê Sûrîye dîyar bikerî, rayberîya Îran, Tirkîya û Rûsya de do pêvînayîşî dest pêbikerî.

Yeno zanayîş ke nê pêvînayîşî newe nîyî; verê cû zî bajarê Cenevre ya Swîsre de bi rayberîya Amerîka de çend reyî kombîyayîşî ameybî viraştiş, labelê nê pêvînayîşan de ti problemê Sûrîye rê çareserî nêameybî dîyayîş. Hetta çareserî hetêk de ronê, problemî hîna giranêr bîyî. Çira o wext sernêkewtbî û problemê Sûrîye çareser nêbîyî?

Vatişêk esto vano; 'Merdim kura de vînî kerd, ganî ewja de bigêro'. Merdim eşkeno vajo ke seba nêyî problemê Sûrîye çareser nêbîyî. Pêvînayîşê Cenevre de zî yê ke beşdar bîyî, ti eleqeya xo bi çareserîya Sûrîye reyde çinêbî. Yê ke beşdar bîyî, bi xo problem bîy û ti projeyê înan çinêbî. Reyna muxatabê esasî yanî kurdî nêameybî dawetkerdiş. Wextê pêvînayîşê Cenevre de yê ke vera çeteyanê DAIŞî de şerê pawitişê rûmet û erjê merdimîye meşnayêne, kurdî bîy. Labelê bi waştişê Tirkîya û sewbîna hêz û welatan kurdî nêameybî dawetkerdiş. Yê ke beşdar bîyî warê pratîkî de ti hêzê înan çinêbî.

Eynî pêvînayîşî na rey do Astana de bêrî viraştiş û yê ke rayberî bikerî zî cîya yî. Her çiqas ke yê ke pêvînayîşan organîze kenî cîya bibî zî, nizdîbîyayîşê hemînan yew o. Verê cû wexto ke kombîyayîş Cenevre de ameyêne viraştiş têkilîya Amerîka û Tirkîya estbî û waştişê Tirkîya ver kurdî nêameybî dawetkerdiş. Ewro zî kombîyayîş bi rayberîya Îran, Tirkîya û Rûsya ra yeno kerdiş. Wezîrê Tirkîya Çavuşoglu vera vengdayîşê wezîrê Amerîka ke vatêne ganî kurdî beşdarê kombîyayîşan bibî de va 'o wext wa DAIŞ zî beşdar bibo'. Yanî çimê îdarekaranê Tirkîya de DAIŞ û kurdî û partîya kurdan yew î.

Ewro Sûrîye de muxalefeto esasin hetê Federasyonê Sûrîyeya Vakurî yê Demokratîke ra yeno kerdiş. Çimkî yê ke heme venganê cîya û kêmaran mîyanê xo de hewêneno; Federasyonê Sûrîyeya Vakurî yê Demokratîke yo. Mîyanê nê federasyonî de heme bawerî, nîjad û fikrî estî. Senî ke Sûrîye cayêko kozmopolît o û heme tewir bawerî û şarî tede ca gênî, merdim eşkeno vajo cewherê Sûrîye yê rastikên mîyanê federasyonî de ca gênî.

Tabî no seba çareserî bes nîyo, wexto ke merdim warê pratîkî ra ewnîyeno, vîneno ke warê pratîkî de zî yê ke erj û rûmetê şarî paweno, Federasyonê Sûrîyeya Vakurî yê Demokratîke yo. Bitaybetî grûbê bînî ke îdîaya muxalefetî meşnayêne, hetê hêzanê herême ra ameyî pasîfîzekerdiş. Nika herême de tena hêzêko bi hawayo rastikên muxalefet keno, Federasyonê Sûrîyeya Vakurî yê Demokratîke yo. Cok ra sey ke vatişê corên de zî derbaz bîyêne, merdim cayêko vînî kerdo de gêreno. Ewro krîz û kaosê Sûrîye demokratîkbîyayîşî ver vejîyayî, nê semedî ra krîzê Sûrîye zî ancax bi demokratîkbîyayîş çareser beno. Demokratîkbîyayîş zî ancax naskerdişê bawerî, fikir û nîjadê cîya-cîyayan mumkin o. Yanî problem nasbîyayîş û muxatabgirîyayîşê Federasyonê Sûrîyeya Vakurî yê Demokratîke beno.

Cok ra Astanaya ke kurd tede ca nêgirî, pêvînayîşê Cenevre ra cîyayêr nêbena û netîceyê ci de zî çareserî nêvejîyeno, tena dem derg beno û krîz û kaos hîna kûrêr benî.

www.arsivakurdi.org

# Ma do qezenç bikerî


Aysun Gezen | Denîze Kîmyon | Fatma Gul Eryildiz | Gulseren Adakli | Îlkay Kara | Işil Unal | Nurîye Gulmen | Esra Dabagci | Sureyya Karacabey

**Çarçeweya OHALî de bi Qerarnameyê Hukmê Qanûnî bi hezaran akademîsyenî karî ra ameybî îxraçkerdiş. Akademîsyenî ke roja sifteyîne ra nata mîyanê têkoşînî de yî, tena çîyêk wazenî û tena çîyêk vanî; "Ma do peyser biagêrî û ma do heta peynî têkoşînê xo bidomnî. Seba ma fakulte de bîyayîş yan zî nêbîyayîş çîyêko muhîm nîyo,wa yê ke teberê ma de yî bifikirî"**

Teşebusê derbe ra dima Tirkîya de rewşa îstîsnayî ameybî îlankerdiş û dima ra bi Qerarnameyê Hukmê Qanûnî bi hezaran kesî karî ra ameybî îxraçkerdiş. Mîyanê nê kesan de akademîsyenê ke unîversîteyan de xebetîyayêne zî estbî. Babete ser o akademîsyenê cinîyî qisey kerdî.

Unîversîteyê Anqara ra Doç. Dr. Gulseren Adakliye va 'ti eleqeya karî ra îxraçbîyayîşê mi çi FETO û çi zî rêxistinêko bîn reyde çin a û her kes zî nêyî baş zano' û wina domnaye: "Her kes seba ke îqtîdarê xo bigiro bin temînatî, nê prosesî goreyê xo xebetneno. Ma do têkoşînê xo bidomnî.

### REAKSÎYONÎ ZÊDE BENÎ

Unîversîteyê Anqara ra Dr. Îlkay Karaye zî wina va: "Ez îdîaya endamîya FETO qebul nêkena. Na kayêka zaf xirabin a. Rektor seba ke vera ci de reaksîyonî zêde nêbî, parçe parçe lîsteya xo aşkere keno."

Unîversîteyê Anqara ra Wezîfedara Cigêrayîşî Aysun Gezene va 'cayê ke fikrê muxalîf û rexnekerdişî pawenî de cayê polîsan çin o' û wina dewam kerde: "Rektor Erkan Îbîşî goreyê fermanê îqtîdarî hereket kerd û bi no hawa erjê unîversîteyî rijna. Êdî merdim nêeşkeno Unîversîteyê Anqara ra vajo unîversîte."

### MA BEDELÊ CI DANÎ

Unîversîteyê Anqara ra Prof. Dr. Işil Unale zî va 'ez zî akademîsyenê ke îmze eştbî vilaweka aştî, înan ra yew a' û wina domnaye: "Na vilaweke vera çîyê ke cografyaya kurdan de qewimîyayêne de seba hişyarkerdişê dewlete amebî nuştiş. Ma nika bedelê ci danî. Ma do peyser biagêrî unîversîteyanê xo."

### WIJDANÊ MA REHET O

Unîversîteyê Anqara ra Doç. Dr. Sureyya Karacabeye zî wina va: "Ma do merdimê ke wijdanê înan rehet o û her tim hewl dayî ke erjê merdimîye bipawî, wina bêrî şinasnayîş. Wa yê ke teberê ma de yî bifikirî. Bi hezaran karker û kedkarî zî karî ra ameyî îxraçkerdiş. Ma înan ra cîyayêr nîyî. Ez do biba vengê înan."

### OHAL KERDÎ FIRSEND

Unîversîteyê Anqara ra Wezîfedara Cigêrayîşî Esra Dabagciye dîyar kerde ke bi OHAL tayê firsendî kewtî destê înan û bi no hawa wazenî vengê muxalîfan bibirnî la ez do mîyanê prosesê bêhuqûqî de ca bigira.

Unîversîteyê Nîgde ra Wezîfedara Cigêrayîşî Fatma Gul Eryildize va seba ke ma va aştî, ma terorîst îlan kerdî û ez do prosesê huqûqî bidomna.

Unîversîteyê Munzurî ra Wezîfedara Cigêrayîşî Emîne Sevîme veng daye mamosta, wendekar û xebatakaran û wina va: "Ganî ma heme xo rêxistine bikerî, sewbîna alternatîfê ma çin o."

### ESTENA RÛMETÎ

Unîversîteyê Ege ra Prof. Dr. Zerrîn Şahîne zî wexto ke karî ra îxraç bîbî, xo dima notêk verdaybî û not de wina amebî vatiş: "Ganî mi ewro ezmûnê fînalî biviraştêne, la KHKyî mi ra ver kewt hereket û persêko giran rona wendekaran ver. Seba mi Fakulte de bîyayîş yan zî nêbîyayîş çîyêko muhîm nîyo. Ez şima rê serkewtiş wazena."

### HETA PEYNÎ TÊKOŞÎN

Unîversîteyê Konya ra Wezîfedara Cigêrayîşî Nurîye Gulmene zî 2 aşmî yo ke Anqara de bi vatişê 'ez karê xo peyser wazena' xover dana, wina va: "Ma do heta peynî têkoşînê xo bidomnî."

Unîversîteyê Anqara ra Doç Dr. Sevîlay Çelenke va 'ma do peyser biagerî'.

Tewr peynî Unîversîteyê ODTUye ra Wezîfedara Cigêrayîşî Denîze Kîmyone zî wina va: "Mi nê 3 qelemî girewtî hetê xo, ez do fek nê qelem û xoverdayîşî ra veranêda. Ma do qezenç bikerî." *ANQARA - ŞÛJIN*

## Çapemenî bîya haletê dewlete



Çarçeweya OHALî de bi Qerarnameyê Hukmê Qanûnî bi hezaran akademîsyenî seba ke îmze eştbî vilaweka aştîye karî ra ameybî îxraçkerdiş.

Nê akademîsyenan ra Doç Dr. Mehmet Rauf Kesîcîyo ke Unîversîteyê Kocaelî ra amebî îxraçkerdiş, qisey kerd.

Kesîcîyî va 'Vilaweka aştîye seba ke vera dewleta qirker de kurdan pawitêne, mi îmze eşt' û qiseykerdişê xo wina domna: "Ma eştişê îmze ra dima bîyî hedefê îqtîdarî; verê Serekkomarî waşt heqaretê ma bikero û dima ra ma ameyî tepiştiş û karê ma destê ma ra ame girewtiş. Ez seba ke xebatanê xo yê akademîk bidomna ameya Ewropa. Ganî welatê Ewropa zî seba merdimê ke mecbûr mendî ke Tirkîya ra aqityayî, tayê çîyan bikera. Eke referandumî de Sîstemê Serekî bêro qebulkerdiş, ez bawer nêkena ke reyna bişînba biagêra welat."

### AKADEMÎYÊ AZADE

Kesîcîyî dewamê qiseykerdişê xo de bale ant Akademîya Piştîdayîşêyewbînanî yê Kocaelî ke hetê 19 akademîsyenan ra amebî awankerdiş û wina dewam kerd: "Çapemenîya ke Tirkîya de ya, bîya ortaxê suco ke îqtîdar û dewlete kenî. (ez çapemenîya kurdan rê nevana) Çapemenî vera problemê kurd û akademîsyenan de nêvejîyena sînorê ke dewlete dîyar kerdo. Seba ke akademîsyenan sîya bikera, çi destê înan ra yeno, kenî."

### MEŞRÛÎYETÊ CI ÇIN O

Kesîcîyî peynîya qiseykerdişê xo de wina va: "Weçînayîşê 7ê hezîrane ra dima sey ke Rayberê Şarê Kurdî Abdullah Ocalanî vatbî 'mekanîzmaya derbe kewte dewre. Derbeya rastikêne hetê îqtîdaro ke neticeyê weçînayîşê 7ê hezîrane nêşinasna û Rojawan zî tede xeylê hetan rê şer îlan kerd ra virazîya. Goreyê mi bedilîyayîşê ke qanûno bingeyî de yenî viraştiş, ti bingeyê înan yê huqûqî çin o." BRUKSEL - ANF

# Krîz esto la sîstemê serekî çin o

Unîversîteyê Kadîr Hasî her serre aşma kanûne de bin nameyê 'Cigêrayîşê Sîyasal û Komelkî' de netîceyê cigêrayîşanê xo yê serrêkî şarî par keno. Sey her serrî netîceyê serra 2016î zî ame parekerdiş.

Goreyê netîceyê cigêrayîşî, se ra 71.7ê komelî de kesî vanî krîzê ekonomîk Tirkîya de esto. Reyna goreyê netîceyê cigêrayîşê serra 2016, Tirkîya de sera 32,5ê kesan Sîstemê Serekî nêwazenî. Netîceyê ke ameyî parekerdiş, wina yî;

Sera 71.7ê komelî vanê ke krîzê ekonomîk esto û sera 55.7ê komelî zî hetê ekonomî ra rewşa înan baş nîya. Labelê hetêko bîn ra zî sera 38,7ê komelî zî polîtîkayê hukmatî ra memnun î û polîtîkayan bi hawayo serkewte vînenî. Goreyê netîceyan weçînitoxê AKPyî ra sera 10,5; weçînitoxê CHPyî ra 68,7; weçînitoxê MHPyî ra 43,6 û weçînitoxê HDPyî ra zî 80,3 polîtîkayê ekonomi yê hukmatî xirabin vînenî.

### BAWERÎ NÊMENDA

Heto bîn ra Tirkîya de sera 59.8ê komelî zî dergbîyayîşê rewşa OHALî nêwazenî. Par bawerîya şarî artêşa Tirkîya rê sera 62,4 bî, labelê her ke şî bawerîya şarî artêş rê kêmî bîye û kewte 47,4. Serra 2011 ra nata seba Tirkîya welatê tewr tehlukeyin Îsraîl ameyêne dîyayîş, labelê na rewşe bedilîyaye û Federasyonê Rûsya bi nîsbetê 64,7 seba Tirkîya tehlukeyin ameye weçînayîş. Emser reyna bi nîsbetê 73,3 Îsraîl welatê tehlukeyin ame dîyayîş. *STENBOL - DÎHABER*



# Alî Haydar Cîlasun wefat kerd

Serekê Rûmetî yê Tevgerê Elewîyê Demokratîke ra Alî Haydar Cîlasun 27ê kanûna 2016 de wefat kerdo. Goreyê îzeheto nuştekî ke hetê keyeyê Cîlasunî ra ameyo dayîş, Cîlasun 27ê kanûna 2016 de saet 08.10 de bi merasîmêk ameyo definkediş.

Îzeheto nuştekî ke hetê Ruçhan Tolgay û Emrah Cîlasunî ra ameyo dayîş wina yo: "Seba vîrardişê Alî Haydar Cîlasunî. Alî Haydar Cîlasun wextê şenikîya xo de bîyo şahide qirkerdişêk û dima ra bi hezaran dêrsimijan û keyeyê xo reyde koçê Kayserî kerd. Cîlasun şenikîya xo ra nata tim bi vatişanê nîjadperest û faşîstan rî bi rî mendo û bi no hawa pîl bîyo. Cîlasun bi eseranê şaîr Nazim Hîkmet Ranî dest bi edebiyat û şîîre keno. Cîlasun dima ra her ke şono eleqeya xo no het de zêde keno û hêrs û hîsê zerrîya xo bi no hawa dano teber."



### CÎLASUN BÊTERS BÎ

Îzeheto nuştekî bi no hawa dewam kerdo: "Hetê tîyatro de zî Alî Haydar Cîlasun temsîlkarîya Brecht û Stanîslawskî kerd. Cîlasun zaf girêdayeyê hunerî bî û hunerê xo kirişt heme dew û bajaranê Kurdistan û Tirkîya. Vera zulme polîs û cendirmeyan û hêrişê faşîst û îslamîstan de bêters hereket kerdêne. Berê ci heme şorişgerê ke hetê dewlete ra ameyênê gêrayîş, akerde bî. Cîlasunî Qirkerdişê 1ê Gulane ra rizgar bî û serrêk ra dima Tirkîya terikna û vejîya teberê welatî. Cîlasunî teberê welatî de zî şorişgeranê Îraq, Peru, Amerîka û Erîtreyî kerd meymanê keyeyê xo. Bi vatişê şaîro namdar Can Yucelî 'wa sereye ma rast nê, çep bibo'. *BERLÎN - ANF*

www.arsivakurdi.org

ROJEVA
Medya
20 Çile În 2017

**ROJEVA MEDYA**
**Ararat Basın - Yayın**
**Reklamcılık Adına**

İmtiyaz Sahibi:
**Murat SEKMEN**

Yazı İşleri Müdürü:
**Mehmet Çetin ALTUN**
***Yönetim Yeri:*** Kooperatifler Mahallesi Akkoyunlu 4. Sokak Sarıca Apt. 2/3
***Yenişehir-DİYARBAKIR***

***Tel:*** 0 (412) 224 35 93
Baskı ***(ÇAP):***
***İstanbul:*** Gün Matbaacılık, Reklam, Film, Basım, Yayın, Tan. San. Tic. Ltd. Şti. Telsizler Mevkii Beşyol Mah.

Akasya Sok. ***No:*** 23/A
***Küçükçekmece İSTANBUL***
***Tel:*** 0 (212) 580 63 81
***Adana:*** Arslan Güneydogu Gazetecilik, Matbaacilik, Kağıtçılık

Yeni Doğan Mah. 2108 Sok.
***No:***13/A ***Yüreğir / ADANA***
***Tel:***0 (322) 346 03 71-72
Yaygın Süreli Yayın
***e mail:***
rojevamedya@hotmail.com

# Zarokên koçber berhemên xwe pêşkêş kirin







Navenda Çand û Hunerê ya Kampa Newrozê bi merasîmekê pêşangehek vekir. Di pêşangehê de destkariyên ku zarokên êzdî yên kampê çêkiribûn, hatin pêşkêşkirin.

Di merasîmê de, bi dehan endamên saziyên civaka sivîl ên bajarê Dêrik û koçberên kampê hazir bûn.

Zarokên ku beşdarî merasîmê bûbûn kêfxweşiya xwe anî ziman û diyar kir ku dema ew tev li navenda çandê ya kampê bûne fêrî gelek tiştan bûne û bang li zarokan kir ku cihê xwe di navendê de bigirin da ku xwedî li kevneşopiyên xwe yên êzidî derkevin.

Her wiha mamoste Egîd Silo jî anî ziman ku vekirina pêşangehê ji bo şadkirina zarokên kampê gaveke pir girîng e. **DÊRIK - ANHA**


# Rewşa aborî her ku diçe xerab dibe

Ji ber krîza aborî û her ku diçe zêdebûna kûra dovîzî, rewşa aborî xerabtir dibe. Esnafên Bazara Şîreyê ya li taxa Eskisaray a Semsûrê jî nesîbê xwe ji vê rewşa xerab girt. Serokê Komeleya Şîr û Penêrfiroşan Ali Riza Ozçakmak têkildarî esnafan axivî û anî ziman ku di berîka mirovan de pere tune ye û ji ber vê jî nikarin pêdiviyên xwe dabîn bikin û diyar kir ku ev rewş bandoreke neyînî li ser wan dike.

Ozçakmak diyar kir ku li Bazara Şîreyê bi piranî berên ku zivistanê tên xwarin ên wekî mewîj, hejîrên hişk, bastêq, loqum, benî û dims hene û wiha axivî: “Wekî ku tê zanîn Semsûr bajarekî sar e. Berê tim di berîka kal û pîrên me de gûz, mewîj, bastêq hebûn. Dema em zarok bûn me dipirsî; ‘ji bo çi hûn van dixin berîka xwe’ digotin; ‘zivistanan ev mirovan germ dikin’. Yanî wekî tê fêmkirin dema ev ber zivistanê bên xwarin mirovan ji sermayê diparêzin û ji bo tenduristiya mirovan baş e. Lê niha em nikarin van beran bifiroşin û welatî jî nikarin bistînin.”

Ozçakmak got ku li gorî sala çûyî karê wan nîvenîv ketiye û wiha got: “Wekî ku tê zanîn, niha li Tirkiyeyê şert û mercên şer hene. Krîza aborî esnaf jî di nav de bandoreke neyînî li ser her kesî kiriye. Li Tirkiyeyê pereyê esnaf û welatiyan tune ye û rewşa heyî her ku diçe xerabtir dibe. Li bazara me 3 hevalên me yên esnaf îflas kir û derabeyên xwe danîn.”

***SEMSÛR - DÎHABER***



# Li warê mişmişan piyasa sekinî ye



Li cîhanê di hilberîneriya mişmişan de, Tirkiye her sal bi nêzî 700 ton hilberîneriya mişmişan di rêza yekemîn de cih digire û ji van mişmişên tên hilberandin hema bêje piraniya wan li Meletiyê tên hilberandin. Lê li gel vê niha li warê mişmişan Meletiyê ji ber geşedanên di qada siyaseta navxweyî û derve de piyase sekiniye.

Ji îxracatkarên mişmişan Medet Kilinç got ku li gorî sala çûyî piyaseya mişmişan îsal pir sekinî ye û wiha got: “Ji vekirina kulîlkên mişmişan heta rewşa wê ya berpêşî bazarê tê kirin cotkar mesrefên mazot, gubre, veguhastin û xebatkaran didin. Lê belê, ji ber krîza aborî buhayên hemûyan zêde bûn û mesrefên hilberîneran du qat zêde bûn.”

Kilinç diyar kir ku kalîteya yekemîn a mişmişan berpêşî bazara welatên Ewropayê, kalîteya duyemîn berpêşî bazarên welatên 3’yemîn û kalîteya sêyemîn jî berpêşî bazarên nav welat tên kirin û wiha domand: “Bi taybetî jî ji ber rageşiya siyaseta bi Rûsyayê re îsal sebze û mişmişên me yên li Antalyayê pir kêm çûn Rûsyayê. Fîrmaya ku berê li ser 500 ton mişmişî bi welatên Ewropayê re bazar dikir, îsal ev daket 100 tonî. Îxracata milyar dolarekê îsal daket 100 milyon dolarî.”

Kilinç anî ziman ku di depoyên hin hilberînerên wan de 7 ton di yê hinan de zêdeyî 10 ton hene û ev tişt anî ziman: “Cotkar dizane dema bifiroşe dê kar neke û li benda saleke din dimîne. Ew jî li benda başbûna piyaseyê ne, lê wisa xuya dike ku dê pîyasa baş nebin. Ji ber ku dolar xwe gihand 4 TL’yî. Zêdebûna mazot û benzînê bandorê li ser çandiniyê jî dike. Ev yek bandorê li ser her kesî dike.”

Her wiha Kilinç destnîşan kir ku hêviya hemû cotkaran ew e ku bi germbûna hewayê re li qadên bazarê liv û tevgerek dest pê bike.

***MELETÎ - DÎHABER***




Li Meletiyê ku hema bêje hemû pêdiviya cîhanê ya mişmişan bi cih tîne, hilberîner ji ber krîza aborî, şerê navxweyî û derveyî qada bazariyê nabînin û zehmetiyan dikişînin. Her wiha ji ber vê rewşê hem esnaf hem jî welatî bi gazinc in










# Jiyan vedigere gundê Xirbit Cehş



Şervanên Hêzên Sûriyeya Demokratîk (HSD) di 14’ê kanûnê de, di pêngava duyem a Hemleya Xezeba Firatê de gundê Xirbit Cehş ê dikeve rojavayê Reqqayê ji çeteyên DAIŞ’ê rizgar kir. Şervanan piştî ku gund ji bermahiyên çeteyan paqij kir, şêniyên gund vegeriyan warên xwe.

Her wiha piştî ku şêniyên gund vegeriyan warên xwe dest bi paqijkirina kolanên xwe, vekirina dikan û sererastkirina xaniyên xwe yên ku ji aliyê çeteyan ve hatine hilweşandin kir. **REQQA - ANHA**



